


WEELAT

Mij belav dibe, Welat germ dibe



✓ Ketina firokeyê ji hela cerde-
vanan ve hate çespendin.

✓ Li gelek cihan çalakî pêk
hatin, bombe teqiyar. Di
çalakiyan de mirovek bi mir 8
mirov birîndar bûn.


✓ Sendikavanek di binçav de
hate kuştin, cendekê bi beşdariya
2500 hate veşartin.

✓ Dadgeha Qanûna Bingehîn
daxwaza Serdozger a ji bo
astengkirina beşdariya HADEP'ê
ya di hilbijartinê de red kir.
(Nûçe: R.3)



Nivîskar Mahmut Baksî:

'Hatt-i mudafa nîn e, sathi mudafa heye!'




■ Niha ku em bêjin: "Niha berê Apo û Mahmût Baksî wisa gotibû. Ez ji ber wê yekê qehirîme." Gelekî Şerm e. Ev dema Kurdistan ava bû, wê di pirtûkên serpêhatiyar de bêne nivîsîn. Aniha tu çi dikî? Ez vê yekê tu caran ji bîra nakim: "Parastina çeperî tuneye, parastina welat heye! (Hattî mudafa yoktur, sathi mudafa vardır)"

■ Ez rojnivîskên (günlük) gerîla dixwînim. Piraniya wan bi tirkî hatine nivîsîn. Ev ji bo romanûserên kurd alavên bêhempa û yekta ne. Camêr! Dil, evîn û doza xwe daniye ser sêniyeke zêrîn raberî te kiriye. Heta tu ji xwedê bixwaze agahî û malzeme heye! En ku ku rojnivîskên gerîla bixwînin, dikarin du sed romanên jî binivîsin. Lê kesî ji wan fêde wernegirt. Divê em şerm bikin.

(Hevpeyvîna bi Mahmut Baksî re: R:8-9)

Azadiya WELAT



E-Mails:berbang.usa.net

SAMI TAN

Bazara sûk û malê hev dernexist

Seremestîya rayedarên dewletê ya destpêkê hêdî hêdî ji ser wan diçe û bi encamên kirina xwe ya erjeng re rû bi rû dimînin. Ev encam wan ditirsîne, lê li xwe mikur nayên.

Dilgirtina Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ji bo wan wekî xewnerojka Tirkêş bû. Li gori encama ku wî ji dirrokê derxistibû serhildanên kurdan bi girtina serokê wan hatine temirandin. Lewre jî wî gelek caran girtina Öcalan pêşniyaz kir, gelek kesên wekî Emin Çölaşan jî piştevaniya wî kir. Lê kesî guhê xwe neda wan. Ji ber çî kesî guhê xwe nedayê?

Di her şerî de hinek peymanên diyar nekirî hene. Öcalan ev yek di hevpeyvîneke xwe de jî nivîskarê Miliyetê Güneri Civaoglu re gotibû. Civaoglu van rojên dawîn bi nivîseke xwe qala vê yekê kir û ew wekî "dehşet dengesi" ango "hevkeşeya erjengiyê" bi nav kir. Ev rêz û rêçik nayên bînpêkirin. Dema ev peyman ji hêla aliyekî şer ve bê pêpêskirin, ew alî bedela wê yekê giran dide. Di navbera PKK û dewleta tirk de jî peymaneke bi vî rengî hebû. Li gori

vê peymanê serok nabin hedef. Lewre dawîya dawî hemû şer li ser maseyê diqedin û divê riya hevdişînê bi temamî neyê girtin. Her çiqas rayedarên dewleta tirk digot: "Em bi PKK'ê re li hev rûnanin jî, bi awayên sergirtî hinek peyman bi riya qasidan dihatin şandin. Heta hinek hevdişîn jî pêk hatin. Derfetên çareseriyê jî hebûn.

Ji ber vê yekê jî bi salan Tirkêş got: "Divê em herin Apo bigirin", lê kesî guhê xwe nedidayê. Dîsa jî ber vê yekê dema kontrayên Tansu Çillerê xwest li hemberî Öcalan êrişekê pêk bînin, Öcalan jî aliyê hinek kesên din ve hate agahdarkirin.

Dawîya dawî bi daxwaz û vîna Amerîkayê dewleta tirk ev peyman bînpêkirin. Riya çareseriyê bi destê xwe girt. Lewre PKK'ê li herêmê berjewendiyên împeryalîstan xiste xetereyê. Bi taybetî xurtbûna PKK'ê ya li başûrê Kurdistanê plan û tevdişîn Amerîkayê serobino dikin. Lewre jî Tirkiye ber bi vê riya xeternak ve ajot.

Rayedarên dewleta tirk jî baweriya xwe bi çirokên Tirkêş anî. Wan jî bawer kir ku bi girtina Öcalan ev serhildan jî de

wekî yên berê bişikê. Lê bazara sûk û malê hev dernexist.

Niha Öcalan di destê dewletê de bi zotek e, destê wan dişewitîne, êş û jan xwe dide dil û kezaba wan. Wekî ku şerê li bakur û başûrê Kurdistanê ne bes be jî her roj li guhekî bajarekî metropolan çalakî pêk tên. Li tu cihê ewlehi nemaye, polisên tirk şev û roj dixebitin lê tu encamê bi dest naxin.

Her wekî te gotin ev lolo ye, hin lê lê li rê ye. Îro kurd di karê pêkanîna çaiakiyên bi vî rengî de hê xêşim in, dê hêdî hêdî di vî karê de bipijin. Wê çaxê de çalakiyên mezintir û bibandortir pêk werin. Wê demê de karê dewleta tirk diwartir bibe.

Rayedarên dewleta tirk her tim bi xelkê xapiyane gel bi serî li zinaran qelibandine. Îttihat Terakî bi Almaniyayê xapiya kete Şerê Yekemîn gelê tirk û kurd xesareke mezin dît. Îro jî rayedarên tirk dibin destikên Amerîkayê û de tiştên nedîtî binin serê gel. Dewletên împeryalîst kêşeyên xwe yên bi vî rengî bi gotûbêjê çareser dikin, lê Tirkiyeyê dixin riyeye kend û kosp.

Rayedarên dewleta tirk
jî baweriya xwe bi
çirokên Tirkêş anî.
Wan got, bi girtina
Öcalan ev serhildan jî
bişikê. Lê bazar sûk û
malê hev dernexist.

"Yên windabûyî û têkçûyî: kurd"

Ferhengok

asteng: engel	nijde: çete
bêgavî: neçarî	nojdarî: selameti
bêguman: bêşik, bêşuphe	palgeh: koltuk
bêhempa: eşsiz	pawan: pasvan, nobedar
beramberî: karşılık	pêwendî: têkili (ilişki)
berkêş: çekmece	piyar: rehîm
bêvac: safsata	qayışkışandin: rekabet, çekişme
çeper: kozik, meterîs	raperîn: serhildan, pêngav
darê dinyayê: yeryüzü	rawestgeh: durak
daxwarin: çekinme, îtaat etme	resen: asil, orjinal
dilovan: hoşgörülü, şefkatli	serpêhatî: anî, hatıra
eletewşî: saçma, dengersiz	serxwebûn: bağımsızlık
erk: rol, fonksiyon	stemkar: zilmakar
gurrekirin: sözünü dinlemek	suriştî: xwezayî, tabî
havîngêh: yazlık	şalyar: wezîr (bakan)
hêjagêh: hedefên leşkerî	tarawgeh: warê sirgûnê
helwest: tavîr	têkçûn: yenilgi, dağılma
heta hetayê: sonsuza kadar	têkoşer: direnişçi
karîger: etkili, etkin	têkûz: békêmanî, temam
kirîger: müşteri	teqemenî: patlayıcı
masîdank: akvaryum	tilwar: kelendi (tırpan)
navnokirin: dile düşürmek	tû: nasir
nêredar: kontrolör	weşangerî: yayıncılık
neşuşî: lanetli	zarokzane: kreş

Reban bawer dikir ku piştî Şerê Cihanê yê Yekemîn alîkariya Dewletên İtifaqê bîkin, bo şkenandina dewleta Osmanî, wê Dewletên İtifaqê xelatekê bidin wan. Lê xelata mezin a ku Brîtanya û Fransayê da wan, bi Peymana Sys Pîcosê parçekirin û mêtîngêhkirina dewletên ereb bû.

Ne ku ereb tenê hatin xapandin kurd jî hatin xapandin û dîtin ku Kurdistan çawa di navbera dewletên Osmanî û Safewî de, wekî du parçe hatibe parvekirin, vê carê di navbera çar dewletan de hate parvekirin. Di sala 1920'an de Peymana Sewrê bo avakirina dewleteke kurd hate gîrdan lê Kemal Atatürk piştî sê salan bi Peymana Lozanê Peymana Sewrê şkenand û li dijî mafê kurdan derket. Di vir de filistinîyan jî gelek zerar dît, cihûyan di sala 1949'an de koçî xaka wan kir û li ser xaka wan jî xwe re dewletek ava kirin.

Îro li wir filistinîyan li ser hinek axê, digel ku hejmara wan hindik e jî ji xwe re dewletek ava kiriye. Lê îro em dibînin ku 20 milyan kurd xwedî mafê xwe nîn in û dewleteke serbixwe ava nekirine. Nexweşiya mezin a kurdan ew e ku îro bela wela ne û ew bi xwe jî li dijî xwe ne. Armanca filistinîyan ew bû ku veşerîna welatê xwe. Lê rewşa kurdan

cuda ye: Daxwazên kurdên Iraqê, yên Îranê, yên Tirkiyeyê û Sûriyeyê hemû ji hev cuda ne. Kurdan bi xwe jî xwe bi vî cudahiye girtine û heta niha jî netewanin xwe jê xilas bikin. Bo nimûne, şerê navxweyî yê di navbera Mesût û Celal, PDK'ya Iraqê û ya Îranê, PKK'ê û PDK'ya Iraqê. Heta gelek caran destên xwe dan dijî birayên xwe yên kurd.

Ji ber ku Tirkiye mafê kurdan hîç qebûl nake, pêwîst e hemû dinya mafê kurdan biparêze. Lewre ev milletê dilbirehm, merd û esîl tu caran dest ji mafê xwe bernade.

Her çend di navbera dewletên li ser kurdan serdest in de, nakokî peyda dibin jî dema ku tê ser serxwebûna parçeyekî Kurdistanê hemû dibin yek û bi awayekî dijwar li dijî wê radiwestin. Ji ber rewşeke wisa Iraqê nexwest ku Abdullah Öcalan bihewîne. Ji ber ku ew jî bo dewleteke serbixwe ya kurdan şer dîke. Pêwendiyên di navbera kurd û tirkan de di sala 1920'an de xerab bûn û her dem kurdan bo serxwebûna dewleteke kurd xebat kir û îro ew kurdên ku alîkariya PKK'ê dikin, bo serxwebûnê xebatê dikin,

ew gundiyên bêsûc ku ketine bin agirê leşkerên tirkan, xwedî tu mafê mirovî nîn in. Ne pirtûk, ne kovar, ne rojname, ne radyo û ne jî televizyon... Hemû gel xwedî van mafan in lê her û her Tirkiyeyê ev nepejîrandiye. Îro girtina Öcalan û darizandina wî wê riyên nû veke bo şoreşa kurdî. An wê zêde bibe an jî wê kême bibe. Mirov dikare rewşa kurdan a îro û filistinîyan rûberî hev û din bike. Filistinîyan li dijî siyonîstan demekê gelek çalakî pêk dianîn, balafir direvandin da ku bala dinyayê bikşînin ser xwe. Îro kurd di wê rewşê de ne.

Ji ber ku Tirkiye mafê kurdan hîç qebûl nake, pêwîst e hemû dinya mafê kurdan biparêze. Lewre ev milletê dilbirehm, merd û esîl

tu caran dest ji mafê xwe bernade. Ewrûpa jî pêwîst e ji ber gunehên xwe yên kevn poşman bibe, alîkariya kurdan bike û li ser dewletên ku kurd di bin destê wan de bisekine.

Îro PKK an jî partiyeke din a kurdan wê zû karibe xwe saz bike û serokekî/ê ji bo xwe bibîne, da ku cardin dest bi şerê xwe bike.

Têbînî: Ev nivîs, sergotara kovara heftane ya erebî *El Meşahid Siyasî* ye, ku li Londonê tê weşandin e.

WERGÊR: B. SEMÎR


Mij belav dibe, şer gur dibe

Mij û dûmana li ser komploya navneteweyî belav dibe û serlîstikvanên komploşê diyar dibin. Li aliyê din bi hatina biharê çalakiyên gerîla jî zêde bûn. Ji destpêka komploşê heta niha firokeyek hatiye xistin û bi dehan leşker hatine kuştin. Rayedarên dewleta tirk li aliyekî van bûyeran vedişêrin, li aliyê din beşdarî merasîman dibin.

Mij û dûxana li ser komploya navneteweyî hêdi hêdi belav dibe û rayedarên dewletê jî li xwe mikur tîn û didin zanîn ku Öcalan ji hêla rayedarên Kenyayê ve hatiye girtin û radestî wan bûye. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine rayedarên dewleta tirk piştî biryara ihtiyatî ya Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê bi raporekê agahî li ser rewşa Serokê Giştî ya PKK'ê Abdullah Öcalan pêşkêşî ve dadgehê kir. Di raporê de hatiye gotin ku çavên Öcalan ji hêla polisên Kenyayê ve hatiye girêdan û tu rola wan di vê yekê de nîn e. Her wiha li ser rewşa Öcalan hinek agahiyên ku bi çavdêriya parêzeran hatiye pûç kirin, dane. Bo nimûne li gorî raporê Öcalan bi hêsanî dikare bi malbat û parêzerên xwe re hevdiîtinê pêk bîne. Her wiha ew dikare pirtûk û rojnameyan bi dest bixe û dewletê radyoyek jî daye wî, da ku li nûçeyan guhdarî bike. Lê tê zanîn ku parêzerên Öcalan bi tenê carekê, ew jî di bin çavdêriya kesên birûpûş de 20 deqîqeyan Öcalan dîtibû û Öcalan dabû xuyakirin ku têkiliyên wî bi cihanê re qutkirî ne. Li aliyê din piştî diyarbûna serlîstikvanên komploşê tiştê ku dê serlîstikvan DYA ji Tirkiyeyê bixwaze tê nîqaşkirin. Wekî daxwaza sereke ya DYA'yê sistemeke federalî li Iraqê tê bilêvkirin. Kesên ku li ser Rojhilata Navîn pispor in, didin zanîn ku êdî Tirkiye dê li dijî planên DYA'yê li ser dijî Iraqê dernekeve.

Cerdevan jî generalên tirk derewîn derdixin

Li aliyê din, piştî biencambûn Kongreya 6'an a PKK û bi hatina biharê re şerê Kurdistanê di navbera gerilayên ARGK û hêzên dewleta tirk de jî gur bû. Li gorî nûçeyê Ajansa DEM gerilayên ARGK'ê di 5'ê adarê de li derdora çiyayê Cîlo firokeyeke Skorsky xistibû û vê yekê di qada navneteweyî de gelekî deng vedabû. Piştî ku nûçe di çapemeniya navneteweyî de cih girt. Çavkaniyên artêşa tirk ev nûçe derewandibû û hatibû gotin ku ev nûçe bêbingeh û bi qestî tene belavkirin. Her wiha di heman nûçeya DEM'ê de hatibû ku li derdora Qilabana Culemergê hêzên dewletê ketine kemîna gerilayan û di vê bûyerê de 8 leşker hatine kuştin. Çavkaniyên Artêşa Tirk ev bûyer jî nepejirandibû, lê roja 9'ê mehê cendekê efserekekî tirk li Enqereyê bi merasîmekê hate rakirin û Serokwezîrê Tirkiyeyê Bülent Ecevit beşdarî ve merasîmê bû. Li dûv ve daxuyaniya Artêşa Tirk Nivîsgeha Çapemeniyê ya ARGK'ê daxuyaniyêke din weşand û xwest ku çapemeniya cihanê were cihê bûyerê û bi çavên serê xwe parçeyên fi-



Bülent Ecevit di merasîma cenazeyê leşkeran de tê dîtin.

rokeyê bibîne. Her wiha çavkaniyên kurd didin zanîn ku ketina firokeyê jî hêla cerdevanan ve jî hatiye çespanandin. Li gorî nûçeyê Özgür Politikayê cerdevanan daye zanîn ku piştî ketine firokeyê jî Hakkari Dağ Komanda Tugayî sê firoke bi hewa ketine û çûne ser enqaza firokeya ketî. Li aliyê din nasnameya leşkerekî ku roja 6'ê adarê li Midyata Mêrdîne digel hevaleyê xwe yî din piştî kemîna gerîla ya bombeyî jiyana xwe ji dest dabû, hate eşkere kir. Li gorî agahiyên ku bi dest ketine navê wî leşkerî Veysel Çift e û jî Zonguldakê ye. Hate gotin ku di vê bûyerê de 2 leşker jî birindar bûne.

Piştî ku êrişeke bombekirinê li dijî waliyê Çankiriyê pêk hat, heftaya çûyî li du cihên Bakirköya Stenbolê bombe teqiyân, di çalakiya yekemîn de ku li ber Navenda Danûstandinê ya Caouselê pêk hat, şofêrê tirempêleke ticarî jiyana xwe ji dest de û 8 kes jî birindar bûn. Li gorî agahiyên şofêrê tirempêlê Ufuk Akdoğan endamê partiya nijadperest MHP'ê

bûye. Di çalakiyêke din de ku li Ataköya heman navçeya Stenbolê pêk hat, gelek erebe şewitîn û ziyaneke mezin a madî pêk hat. Ji bilî van li gelek cihan jî ciwanên kurd bi molotofan êrişê birin ser hinek malên dewletê û hevalbendên wê. Li hemberî vê yekê hêzên dewletê jî êrişê birin ser gelek cihan, gelek mirov hatin binçavkirin û hinek mirov jî hatin kuştin.

Sendikavanek hate kuştin

Roja 5'ê adarê hêzên ewlekariyê yên tirk avêt ser rojnameyên wekî Atılım, Sömürsüz Bir Dünya İçin Dayanışma û navenda çandê BEKSAV'ê, di van cendan 43 kes hatin binçavkirin. Di nav wan kesan de Pisporê Perwerdehiyê yê Sendikaya Limter-İşa girêdayî DİSK'ê Süleyman Yeter jî hêla polisên ve bi îşkenceyê hate kuştin. Her çiqas dozgerê Fatih Stenbolê Fevzi Gümüşhan da zanîn ku li ser cendekê Yeter şopa lêdanê û îşkenceyê nehatiye dîtin jî, rapora parêz-

erên wî diyar dike ku îşkence li wî hatiye kirin. Di rapora parêzerên Yeter Gülsenen Yoleri, Keleş Öztürk, Tahsin Ayçık, Metin Kozan û Metin Narin de tê gotin ku li ser laşê wî gelek birin û şopên îşkenceyê hatine dozandin û neynûneke wî jî hatiye kişandin. Di dawiya raporê de ev tişt hatine gotin: "Li gorî çavdêriyê me, ji şopên li ser laşê wî tê fêmkirin ku Süleyman Yeter li Şaxa Têkoşîna bi Terorê re îşkence dîtiye. Berê tu nexweşiya wî tunebûye, piştî delîlên ku me bi dest xistine em dikarin bibêjin ku ew bi îşkenceyê hatiye kuştin." Kuştina Süleyman Yeter jî hêla gelek saziyên demokratîk ên wekî NÇM, HADEP, Politikada Atılım, Sekreterê Giştî yê İHD'yê Hüsnü Öndül û EMEP'ê ve hate şermezarkirin û hate xwestin ku kujerên wî bêne darizandin û xistinandin.

Cendekê Süleyman Yeter bi beşdariya 2500 kesî li Goristana Alibeyköyê ya li Stenbolê hate veşartin. Kesên ku beşdarî merasîma cezayê wî bûn, bi pankart û sloganên xwe ev bûyer şermezar kir.

HADEP beşdarî hîlbijartinan dibe

Dadgeha Qanûna Bingehîn ya Tirkiyeyê daxwaza Serdozgerê Dadgeha Bilind Vural Savaş di cih de nedît û daxwaza wî red kir. Bi vê biryarê astenga li ber beşdariya HADEP'ê ya di hîlbijartinan de jî holê rabû. Her wekî tê zanîn Savaş bi hinceta ku di navbera HADEP û PKK'ê de têkiliyêke rastrê heye û beşdariya HADEP'ê ya di hîlbijartinê de, dê bi xwe re gelek arîşeyan bîne, xwestibû beşdariya wê bê astengkirin. Lê parêzerên HADEP'ê jî bi daxwaznameyekê serî li dadgehê dabû û diyar kiribû ku hincetên Vural bêbingeh in. Roja 8'ê adarê heyeta Dadgeha Qanûn Bingehîn li hev civiya û biryara redkirina daxwaza Savaş girt.

Hate ragihandin ku ev biryara dadgehê jî tirsê helwesta tund a kurdan û rexneyên Ewropayê hatiye girtin. Li gorî xwediyê van nirxandinan, bi taybetî li bajarên Kurdistanê HADEP'ê wekî partiya tekane tê dîtin û astengkirina beşdariya wê, dê rewabûna hîlbijartinê jî holê rakira.

Lê êrişên li ser HADEP'ê piştî vê biryarê gurtir bûn. Gelek berendamên HADEP'ê hatin binçavkirin û hinek jî wan hatin girtin. Derdorên siyasî didin zanîn ku dewlet dixwaze bi van êrişên xwe nehêle ku HADEP xebata xwe ya hîlbijartinê bimeşîne û bi vî awayî jî dixwaze di hîlbijartinê de têk bibe. Lê rayedarên HADEP'ê diyar dikin ku kurd dê vê hêviya dewletê jî bi avê de bibin û pêkan e ku HADEP benda giştî jî biteqîne û mebûsên xwe bişîne meclîsa tirkan.

NAVENDA NÜÇEYAN

Komployê hemû kurd şiyar kirin



Îsraîl

Di Rojhilata Navîn de ji bo ku desthilatdariya xwe xurt bike li pey pir lîstikên politik, leşkerî, aborî û kar û barên sîxûrî ye. Parçekirina yekîtiya ereban, pêşbirîna tevgerên dij-împeryalist, jiyandina kapîtalîzmê û serkeftina nijada cihûyan armancên wê yên sereke ne. Ji bo vê, îtifaqan çêdike, bi rêbazên sîxûrî gelan berî hev dide. Ev demek e bi Tirkîyeyê re têkiliyên xwe xurt kirine. Sedema wê jî kurd in. Hem tevgera PKK'ê lîstikên wê yên li Rojhilata Navîn serobinî hev dike û hem jî axa kurdan ji bo berjewendiyên wê girîng e. Karsazên Îsraîlê li Kurdîstanê gelek zevî, cih û war kirîne. GAP'ê finansê dikin. Dîsa dewleta Îsraîl amadekariya damezirandina herêmeke leşkerî dike. Bi vî awayî hem dixwaze rola xwe ya li ser avê û hem jî axa Kurdîstanê bileyze.

Ji ber vê yekê cihgirtina wê ya di komploya li dijî Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan hatiye lidarxistin de ne, bêsedem e.

Amerîka

1-Pêdiviya Amerîkayê bi neftê zêde ye. 2 Rojhilata Navîn xwedî şaristaniyeke kûr e. Hêmanên misilmaniyê, çanda şoreşgerî û zengîniyên aborî hene. 3 Li aliyekî herêma bazara bazirganiyê ye li aliyekî jî xwedî madeya xav e. 4 Yekîtiya kurdan, yekîtiya ereban, yekîtiya farisan û yekîtiya tirkan hêzên sereke, azad û xurt derdixe holê. Ev yek jî ji serdestî û mêtîngeriya re asteng e. 5 Piştî hilweşîna Sovyetîstanê globalîzm hate rojevê. Bi vî awayî mêtîngeriya kapîtalîst zêde bû. Li dijî vê, berxwedanên qels hene. Berxwedanên yekser ji bo wê tirs û xofê tînin lewma jî êrîşên xwe zêde dike. 6 Parkirina bermahiyên Kevne-Sovyetê pêwîst e. Her wiha zengîniyên Asyaya Navîn, Qafqasya û Balkanan girîng in. Dîsa ji

xeynî van deran herêma Baltîk, rojhilatê Ewrûpayê û Çîn bazarên nû ne. Ji bo vê yekê jî Amerîka dixwaze li herêma Rojhilata Navîn hêzên dijber û berxwedêr biçilmisîne û bifefîne. 7 Qeyrana aboriyê kapîtalîzmê ditirsîne. Bîrdoziya globalîzmê hê rûnenîştiye. Ji bilî qeyrana navborî, qeyrana bikaranîna teknolojiyê, qeyrana felsefeya jiyane heye.

Gelên bindest xwedî pirsgirêkên aborî ne. Birçibûn û xela berfirehtir dibe. Mêtîngeriya gelên di bin kontrola xwe de ji hêla jiyane ve qelandine. Bêyî armanca xwe, kuştin zêde dibe. Ji ber vê reaksiyonên li hemberî globalîzmê jî zêde dibin. Lê bîrêxistin in. Eger ev hêz bîrêxistin bin jî ji bo împeryalîzma Amerîkayê tirs û xetereyeke mezin e.

PKK li hemberî daxwazên Amerîkayê yên ku li jor hatin rêzkirin asteng e. Lewma jî Amerîka ji bîrdoza PKK'ê û serokê wê ditirse. Çimkî gava ku rêbaz û îdeolojiya PKK'ê ji aliyê gelên cihanê ve bê nas-kirin, pergala Amerîkayê dê hilweşe.

Jixwe ne hewce ye ku dagirkerên Kurdîstanê bêne nixandin. Kiryarên wan bi her awayî li darî çavan in. Dewletên ku di komploya li dijî serokê PKK'ê de bûne pi-garê hev û din û Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan revandiyê, li Tirkîyeyê biryarek daye. Naveroka biryarê tunekirina serokê gelê kurd, PKK'ê û bîrdoza wê ye.

Hetanî roja îroyîn li hemberî meşa Tevgera Azadiyê Rûsya, Ewrûpa, Amerîka û Îsraîlê helwesta xwe evqasî zelal nekiribû. Hêviya wan ew bû ku PKK xwe bi xwe birize, li hemberî êrîşên Tirkîyeyê têkeve tengasiyê û tîk biçê. Lê ev payîna wan neçû serî. Ji ber vê yekê ew bi xwe ketin dewrê, asta politikayên xwe yên şêlî zelal kir û biryara tunekirina PKK'ê da.

Êrîşkarên ya berxwedanê ya gelê kurd nehesiband: Li gorî wan ew çend cihan

xwepêşandanê çêbûna, yek jî çend heb erîşên leşkerî dê pêk bihatana û peyre vemirîna. Lê ji vê wêdetir berxwedanên bêtir berfireh û gur pêk hatin û xuya ye dê hejî gur bibin.

Komplo û berxwedanê hinek tişt ronî kirin

Mirov dikare bi dorê wiha rêz bike:

1-Kiryarên sîxuriyê.

2-Êrîşên nedadyane û rûyê mêtîngariyê yê rastîn.

3-Nakokiyên di nav dewletan de: a Daxwazên Dûmayê û rêveberên hevkarê Amerîkayê bi hev ketin, b Rêveberên Yewnanîstanê yên di komployê de cih girtine û gelê yewnan bi hev ketin, c Kurdên ku li ber konsolosxaneyê Îsraîlê hatin kuştin, helwesta Almaniyayê jixweber ronî kir. Gelê Almaniyayê ev yek nepejirand. Meş û berxwedanên gelê kurd ên ku li Ewrûpayê pêk hatin ji hêla gelên Ewrûpayê hatin qebûlkirin û ewrûpiyan ve bi dilxwazî piştewaniya kurdan kir.

4-Kurd bi hev û din hesiyan. Kurdên li Rojhilat, Bakur, Başûr û yên li seranserê cihanê dest bi çalakî û serhildana kirin. Bi salan e ev yek ne mimkûn bû. Bi vê bûyerê re hişê gelê kurd ê bi mij û xumam zelal û ronahî bû. Bo rêxistinên kurd rîya piştgeriyê û dewleteke serbixwe vebû. Gel hîni lidarxistina çalakîyên xwe bi xwe bû.

5-Ji bo gelên cihanê pêleke nû dest pê kir. Hêzên ku li hemberî êrîşên mêtîngeriya çilmsibûn ji nû ve şax dan. Bi girîngiya yekîtiyê û hêza berxwedanê hesiyan.

6-Li hemberî kapîtalîzmê tîrêjeke nû şewq û şemal da. Gelê Ewrûpayê yê ku ji aliyê derûnî ve hatiye hingaftin rîyeke nû dît. Ber bi hişyarbûnê ve diçe. Dîsa gelên Rojhilat û Rûsya li hêvî û rûmeta xwe xwedî derketin.

(Qediya)

AHMET KAYA

✓ **Komployê nakokiyên navxweyî yên dewletan kûrtir kir. Bi taybetî li Ewrûpayê, Rûsya û Yewnanîstanê reaksiyonên gel ên li hemberî dewletên xwe tûjtir bûn. Gelên welatên navborî bi awayekî aktîf piştewaniya xwe bo gelê kurd nîşan da.**

✓ **Bi vê pêvajoyê re kurd bi hev û din hesiyan. Kurdên li Rojhilat, Bakur, Başûr û yên li seranserê cihanê dest bi çalakî û serhildanan kirin. Bi vê bûyerê re hişê gelê kurd ê bi mij û xumam zelal û ronahî bû.**

Rexneyek li zimanê A. Welat

Ji demeke dirêj ve ye ez rojnemeyê naşopînim, lê dema Welat derdiket min hemû hejmarên wê xwendibûn. Ev bû sê çar hejmar ez Azadiya Welat dixwînim, li gorî nêrîna xwe ez gelek çewtiyan tê de dibînim.

Ezê wan çewtiyan digel nêrinên xwe yên li ser wan ji were diyar bikim.

1- Derbarê mafê peyvên çêkirî de dema ku peyv bêne çêkirin bila terz û awaza kurdî hebe neyê jîbîrkirin. Di peyv çêkirinê de divê rêpîvanên rêzimana kurdî be. Ez di peyvên mîna kirû, berik, xwefiroş, bûyer, giştîname, civatzanîn, konevanzanîn, hevedudanî, yasazanîn, fêrulzanîn, kurtname, erdhêjzade, cîranwelat, bavkafir, bavzalim, kurmancîaxêv, dartiraş û hwd. de terz-awaz û rêzimana kurdî nabînim, di van peyvyan de terz û rêzimana tirkî gelek di pêş de ye. Mînak: Kurmancîaxêv: konuşan, dartiraş: ağaç yontma, konevanzanîn: siyaset bilimi û hwd.

Şêwaz û rêzimana erebî F.H. Sağnıç baştir dizane, mîna fêrulzanîn. Di şûna van peyvyan de ez bawer im yê otantîk mînak: qewimîn a teba. Heke em di nava hevokê de bi kar bînin, "ev çi teba bû hat serê me", "belakî mezin li serê me qewimî". Azîneyeke gelekî hêsan a rêzimana kurdî li ber çavan nayê girtin, mirov dikare bi hinek mînanan ve azî-

neyê diyar bike: Xwefiroş: firoşay, hevedudanî: hevçîrtî, cîranwelat: welatên cîran, bavkafir: kafirbav û hwd.

2- Li ser bikaranîna hevokan di rêzimana kurdî de mînak: "Min baz da ku ez haya malê pê bixim" "an min heq heye." Di van hevokan de rêzimana kurdî tew nehatiye bikaranîn. "Gelo rastiya van hevokan pir zor bû ku bihata bikaranîn."

Ez baz dam ku ez haya malê pê bixim "an heqê min heye." Dema mirov rast û çewt tîne ber hev gelek cûdahî tê dîtin, hinek hevok ji tew tu famê nadin mirov, mînak: "Tenê dimînim karene xweşik di çaxê ku xweşikbûn ji hev dikeve xwe eşkere dikin. Mîna bi xwe ji vê hevokê tiştek fam nekir. Hinek hevok ji peyvên çewt di nava xwe de dihewinin, mînak: Lê vê carê ne



di çerçewîne hazirkirî de. Di vir de peyveke gelek çewt heye, rastiya wê çarçof we, ya diduwa "em bi çavê ku dinya li me dinihêre ne, bi çavê ku mêtînger li me dinêre li xwe dinihêrin" di vê hevokê de xwendevan difikire gelo dinihêre an dinêre, kîjan rast e. Yek jî di hevokê de peyva "ne" di eslê xwe de "na" ye, ev

peyv di hinek hevokan de wekî "ne" di hinekan de jî wekî "na" tê bikaranîn.

An jî li gor wateya hevokê tê guhartin. Mînak: "Ez nedihatim an ez neçûm" ya dîn "Gava ez hatim "na" gava ez çûm" di hevoka we de "ne" jî çewt hatiye bikaranîn famê zor dide mirov.

3- Li ser rêzimana kurdî wane 21

Di vê nivîsê de di sernivîsa xwe ya

biçûk "Gihan" de dibêje ku "gihanek", bi serê xwe tu wateyê nade, mînak dane, mînak ev in: Bes, bila, çawa, wisa jî, her çend, ew çend, çiqas, ewqas, lewre, dibê ku, jî, heke na, nexwe, dema ku, he-ta ku, hew, mixabin, di ser de jî hwd. Li gorî famkirina min rast e hinek bi serê xwe ne xwediyê tu wateyê ne, lê hinekê din ne wisa ne, mînak çiqas (ne kadar), ew qas (o kadar), çawa (nasıl) û hwd.

Ez dixwazim dîsa vegerim ser girîngiya mijarê wek ku hûn dizanin zimanê me kurdî ji gelek aliyên de pir bi gelş û gengeşî ye. Lê divê yê ku xwe ji çêkirin an pêşvebirina zimanê kurdî berpirs dibînin bila bizanibin ku ev berpirsî gelekî mezin e. Li şûna pêşvebirinê divê em bi paş ve nebin. Di hevokê de tipek kêman çewt be û hevok ji aliyê rêzimanî ve çewt û şaş be, naveroka wê diguhere, hevok tu famê nade mirov.

Bi dîtina min xebata we di bin bandora zimanê tirkî de dimeşe, bi vê meşa hanê wê xebata we jî marjînal bibe, dawiyê hûnê ji xwe re binivîsin, hûnê çêkin, hûnê bixwînin. Li aliyê din her tîp, peyv, hevoka çewt di serê xwendevan de cih digire, rastkirina çewtiyên bi vî rengî gelek dijwar e.

GERNAS AVŞÎN

Bihara rengîn

NEJDET BULDAN



E-Mail: Buldan@compuserve.com

Adar, avrêl û gulan, her sê mehên biharê.

Dema qala biharê tê kirin, adar tê bîra mirovî. Adar destpêka biharê, bihar destpêka jiyan, zayin û zêdebûnê ye. Bihar bêhn e, bihar reng e, bihar dewlemendî ye. Bihar av e, çiya ye, deşt û zozan e. Bihar xeml e. Bihar roj e û germ e. Bihar deng e, stran e û helbest e. Bihar govend e. Bihar xebat e, şer e û ceng e.

Adar, şînbûna giya û daran, xeliyana (helîna) berf û keviyan, zêdebûna av û robaran e. Adar mizgîniya biharê ye. Wateya adarê ji bo Kurdistanê girîng e. Tê gotin ku desthilatiya Deheqê zilimkar di meha adarê de hilweşiyaye. Agirê ku bi destê Kawayê Hesinger hatiye hildan bû-

ye agirê têkoşînê. Rojên keftina Deheq ji bo kurdistanîyan bûya roja nû; yanî Newroz; cejna azadiyê, jiyanê û serxwebûnê.

Mazlûm di meha adarê de bû Kawayê Hemdem, dîwarên sar ên Zindana A-medê bi agirê bedena xwe germ kir. Xof û tîrsa ku bû hesin û kevir, di bedena wî de xeliya. Hat zanîn ku serma û tîrsa bi destê hovan tê çêkirin, bi nîsbetî bîr û baweriyên dilên şer bi çîrûskeke agirî tê vemirandin. Agir di bedena berxwedêran de dibe av û agirê tîrsê vedimire.

Meheke din a biharê gulan e. Gulan bi Ferhat, Eşref, Nejmî û Mexmût bûye gulan. Gulan vebûna gul û kulîlkan e. Kulîlkan ku di zîndanên de dibîşkin, bêhn û têhna xwe dikarin bidin hemû deverên cîhanê. Cîhana ku nedîtibû ku agir bi bedena mirov de geş dibe. Her çar gulên hejdayê gulanê bûn sedema gulvebûna hemû Kurdistanê. Hat zanîn ku heke mirov bixwaze dîwarên sar, tîrsa di mêjiyê mirov de bûye hesin, nikare pêşiyê li berxwedanê bigire. Hat zanîn ku gul û kulîlkan tenê ji giya û daran çênabin. Gul û

gulçîçek ji bedena mirovan jî çêdibin.

Paşê Zekiye, Rewşen, Ronahî, Bêrîvan û gelekên din, gişt bûn agirê Newrozê. Newroz jî bû roja serhildanan. Serhildan ji bo dijmin bûne şevên reş û tarî. Tu deverên Kurdistanê nemane ku li Newrozê xwîna wan nehatibe rijadin. Ne tenê Kurdistan, cihên ku kurd tê de koçber in jî. Li Almaniyayê devê robarê Rein jî bûye warê Newroz pîrozkirina bi agirê bedenên.

Paşê ji bo kurdan hemû roj bûne Newroz. Li zindanan, li meydanan, li welat û derveyê welatî; ji Moskow heta Roma, Mehabad û Silêmanî, her bedeneke kurd bûye agirekî Newrozê.

Niha çavên me li xudanên meseleyê yê esas, li gerîlayan e. Dema ev nivîs dihate nivîsandin wan agirê adarê yê xweş di bedena skorskiyekê de geş kiribû. Bila dewleta tirk qebûl neke. Wan Newroz jî nedipejirand, berê. Niha dixwazim Newrozê bikin tirkî.

Nevruz derew û lêbandin e. Newroz xebat e, şer û ceng e.

Şoreşgereke suriştî

Cihan Yusufoglu



Cihan Yusufoglu, di sala 1974'an de li gundê Kermirara bi ser Qoserê ve ji dayik bûye. Ew, di sala 1992'yan de tevî refên gerîla dibe û li ser giliyê di sala 1993'yan de ligel sê hevalên xwe digihêje karwana pakrewanên Kurdistanê. Ew û hevalên xwe wekî "Şehîdên Xursê" tên naskirin. Piştî şehadeta wan gerîla diavêjin ser emniyeta Qoserê û çalakiyêke tolhildanê pêk tînin.

Cihan (Hêvî), di sala 1974'an de li gundê Kermirara bi ser Qoserê ve ji dayik bûye. Zarokatiya wê li gund derbas dibe. Dibistana seratayî li gund qedandiye. Malbat û derdora wê doza kurdayetî welatparêziyê dikir. Rêxistinên cur bi cur, zêdetir jî endamên KUK'ê bi vî gundî re diketin têkiliyê û xebatên şoreşgerî dimeşandin. Cihan, dema ku hêdî hêdî xwe nas dikir, hêza tevgera azadiyê pêl bi pêl di nava gel de belav dibû. Malbata Cihanê jî ji vî tevgerê dîr nedima.

Mirov dikare bibêje xweseriyêke Cihanê hebû. Wê, her dem bi awayekî ne bi zanabûn be jî, serî li ber her tiştî radikir û têkiliyên malbatê yên paşverû,

rewşa jina kurd bi tundî rexne dikir. Cihan wekî keçên gundî tevnegeriya. Bi rastî malbata wê jî di warê têkilî danîne de piştigiriya wê dikir û dihişt ku ew bi serbestî û azad tevbigere.

Dem bi pêş de diçû, Cihanê dema ku bi keç û xortên gund re danûstandin pêk dianîn, malbatên gund ên din acizî ji ber dikirin û heta car caran ew ji mala xwe diqewirandin. Lê wê, bi tu awayî ev nedida ser bala xwe û têkiliya xwe bi keç û xortan re didomand. Heke şertên di mala hevalên wê de nedima, diçû mala cîranan û bang li hevalê xwe dikir, bi vî awayî bi wan re dida û distand. Malbatên gund ji ber tevgera wê, gilî û gazincên xwe li bav û birayên Cihanê dikirin.

Cihan Yusufoglu, berî ku şoreşê binase, bi helwesta xwe ya dijber û mirovane bala mirovan dikişîne. Wê, rexne li jin û mêrê gundê xwe girtine. Lewre ew wekî şoreşger û pêşengeke suriştî darî çav dibe. Ji ber vî hindê gundî nikarin tevgerên wê ragirin û lewma li cem malbata wê giliyê wê dikan. Piştî ku tevî refên gerîla dibe, di demeke kurt de bi pêş dikeve û wekî berpirsiyara komikeke gerîlayan li Qoserê şervaniyê dike.

Li aliyê din hêdî hêdî gerîlayên ARGK'ê li derdorê xuya dibûn. Cihanê jî, ew diditin û ew ji nêzik ve nas dikirin. Jixwe ew gelekî bixwebawer û piştrast bû. Wê, piştî ku gerîlayên ARGK nas kirin, bi taybetî yên jin, bêhtir bixwebawer bû. Piştî dîtina gerîlayan guherînên berbiçav di kesayetiya Cihanê de pêk dihatin. Berê, bi awayekî nezanî serî hildida lê êdî bi şewaza gerîla tevdiageriya. Zewac û xweziyên mirovên sistemê bi yekcarî, bi awayekî îdeolojîk red dikir û propagandaya PKK'ê dikir. Dema ku li nav gund digeriya, kesên ku lê rast dihatin, dema jin bûna, digote wan: "Dev ji van fesadî û paşgotiniyan berdin!" Dema xort û mêr bûna, mêrîtiya wan a paşverû li ser çavê wan dixist û digot: "Ez zewacê qebûl nakim! Ez ranagirim ku mêrê bêxîret nikula li serê min bixe!"

Gund dorê li min teng dike

Cihanê, êdî hevalên xwe li hev diciwandin û dest bi propagandayê dikir. Wê, tevî hevalên xwe diçû alîkariya malbatên gund dikir û bi vî awayî dixwest hevkarî û komkariyê li ba wan xurt bike. Li aliyê din êdî gundî hêdî hêdî li êrişên leşkeran rast dihatin. Li ser vî yekê tu tirsê bide aliyekî, Cihanê cesaret dida gundiyan.

Cihanê her wiha bi dengê yê xweş û ziz jî bala gundiyan dikişand. Bi taybetî di dawetan de serî dikişand û ji zarok û hevalên xwe re stranên Koma Berxwedanê digotin. Malbata Cihanê ji aliyê aborî ve ne qels bû û wê çî bixwesta dikaribû peyda bike. Lê ew, her dem pêlaveke sporê di lingê wê de, şalekî kot lê digeriya. Wê, tu caran guh nedida zêr, zîv, bazin hwd.

Mirov dikare bibêje, Cihanê gelekî bala gundiyan dikişand. Gundiyan tevgera wê gelekî ecêb dît û li ser nîqaş dihaten kirin. Wekî mînak, carekê xalê wê, ji bo ku ji porê wê yê berdayî aciz bû, wê xalê xwe bi zimanekî tûj hişyar kir.

Cihanê ji bo gundiyan kesayetiyeke nû bû û zû bi zû nehate nehewandin. Ji ber ku Cihanê ne keçeke klasîk bû. Piştî van bûyeran, dema Cihanê Partî baş nas kir biryar da û got: "Êdî sinorên gund dorê li min teng dikan!" Ew û sê hevalên wê tevî refên gerîlayên ARGK'ê bûn (1992). Ji ber ku têkiliya wan bi Partiyê re qut bû, Cihan li dora panzdeh-bîst rojan li Qoserê ma. Di vî navberê de li ser giliya hin kesan dewletê berê xwe da xebatkarên eniyê lê Cihanê ji ber ku Qoser baş nas dikir, nehişt ku têkiliyên Partiyê eşkere bibin û heval bi însiyatîfa xwe birin cem nasên xwe û ew veşartin.

Şehadeta wan

Piştî rojên Qoserê, derbasî Başûrê Mezin bû. Lê di demekê kin de, Partiyê careke ew wekî berpirsiyara komeke biçûk ya gerîlayan şand derdora Qoserê.

Piştî demekê, Cihan û hevalên wê Ahmet û Zekiye li devera Xursê li ser giliyê, li êrişê dijmin diqelibin û şerekî dijwar derket. Di dawiya şer de Cihan û her du hevalên wê şehîd ketin (1993). Her wiha di vî şerî de du leşker jî hatin kuştin. Piştî şehadeta Cihan û hevalên wê (Şehîdên Xursê), gerîla diavêjin ser emniyeta Qoserê û diqirin: "Heyfa Şehîdên Xursê li erdê nema!"

Tê gotin ku kesên çalakî lidarxisti bûn hevalê wê yê dema îxbarê de Hêvî ew veşartî bûn. Vê şehadetê, bandorek mezin li herêma Qoserê kir. Dijmin ji cesedên Cihan û hevalên wê jî ditirsiya. Her wiha cesedên wan li cihê ku şehîd ketibûn, ji aliyê hêzên dewletê ve hate veşartin. Malbata Cihanê çiqas xwest ku termê wê û hevalên wê bistîne jî, ev yek nehate qebûlkirin.

Ew pêvajoyê jixwe gelekî germ bû. Germahiya şoreşê bû. Wekî li seranserî Kurdistanê li Qoserê jî serhildanên gelê kurd berfireh bûbûn û bi hezaran kes beşdarî serhildanan dibûn. Bi coşeke mezin derbas dibûn.

CENGİZ YUSUFOĞLU

□ 17 adar 1993:

PKK'ê cara yekemîn agirbest îlan kir

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan li Geliyê Bekaya Lubnanê li Gundê Bara-Elfasê li hemberî çapemenî û TV'yên tirk agirbesta yekemîn îlan kir. Agirbesta yekemîn a yekalî di navbera 20'ê adarê û 15'ê avrêlê de hate bisinorkirin.

Di vê agirbesta 25 rojî de dewleta tirk guh neda agirbestê û bi dehan gund vala kirin û êriş bir ser gelek şervanên kurd.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 16 adar 1988:

Helepçe hate bombebarankirin

Dewleta Iraqê roja 16'ê adara 1988'an, di bin serokatiya Sadam Huseyn de Helepçe bombebaran kir.

Di vê êrişê ku bi çekên kîmyewî hate kirin de di ser pênc hezarî re zarok, jin, kal û pişên kurd bi jehra çekên kîmyewî hatin qetilkirin. Bi hezaran mirov jî birîndar man.

Kampanyaya "Azadî ji bo Öcalan, aştî ji bo Kurdistan" dest pê kir

Nivîskar ketin tevgerê

Nivîskar û rewşenbîrên navdar Lord Avbury, Harold Pinter, Noam Chomsky û Arthur Miller kampanyayek bi navê "Azadî Ji bo Öcalan" da destpêkirin. Armanca vê kampanyayê ev e ku Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan were berdan.

Kampanyaya nivîskar û rewşenbîrên navdar hefteya din dest pê kir û hate gotin ku heta ew çareseriyekê bi dest nexin dê kampanya berde-wam bike. Lord Avebury, Harold Pinter, Noam Chomsky û Arthur Miller di çarçoweya kampanyayê de nameyek ji bo rewşenbîr, nivîskar û hunermendan nivîsand.

Nameya wan bi vî rengî ye:

Komara Tirk ku rêveberiya wê di destê Lijneya Ewlehiya Neteweyî de ye, wek netewe-dewletekê bi hêza leşkerî neteway tirk desthilatdar kiriye û ew, li ser konseptê dewleta hevgerî (üniter) ava kiriye. Qanûna Bingehîn a Tirk û Qanûna Cezayî ya Tirk derfetê nade kesên ne tirk. Di vê rewşa polîtîk de mirov nikare qala wekheviya neteweyî û nirxên demokrasîyê bike. Her wiha stratejiya nijadperest a giran û militarîst a dewleta tirk bi awayekî tund rê li ber hewldanên aştiyane yên ji bo mafên gelê kurd digire. Lewre dewlet niha ji li ser xweparastina adilane û azad a rewşa siyasî ya Serokê PKK'ê birêz Abdullah Öcalan ê ku dil hatiye girtin, dibe asteng.

Dewleta tirk ji roja ku ava bûye ve çavên xwe ji hemû peymanên navneteweyî re girtine û bi hêza leşkerî û qanûnên awarte serbestiya derbirinê binpê dibe û her daxwaza gelê kurd bi tundî înkâr dibe. Her gengeşiya li ser pirsgerêka kurd, bi cudakarî û terorîstî tê binavkirin. Lê li aliyê din roja 15'ê reşemîya 1999'an bi rengekî zorbazî û li derveyî zagonan ji Kenyayê revandîna Abdullah Öcalan û anîna wî bo Tirkiyeyê bi rastî bi navê hiqûqê serdandê durûtî ye. Heta ku ev navlêka cudakarî û terorîstî ji holê neyê rakirin, di parastina kurdan an jî ya serokê wan de hevokê jî li gori rastîya xwe nayê zimên. Roja 23'yê reşemîya 1999'an der barê birêz Öcalan de bi hinceta xiyankariyê dozê hate vekirin û dozgerê dadgeha ewlekariya dewletê ji wî îdam xwest. Lê dîmahika wê ji heye, di vê rewşa hanê de, bikaranîna hiqûqê wê çawa pêkan be?

Dema birêz Öcalan di 16'ê berfanbara 1999'an hate mecbûrkirin ku ji Îtalîyayê derkeve, hîn serlêdana wî ya paneberiyê nehatibû bersivandin. Bi vî awayî jî ew derfeta forûmeke navneteweyî ji bo çareserîya kêşeya kurd ji dest hate revandin. Birêz Öcalan piştî vê bûyerê bi mehekê hate revandin û medyaya tirk jî bi rengekî ku gelê kurd biçûk dixê dest bi çêran kir. Ev rewş ji bo nêzîktêdayineke erênî bo vê pirsgerêka binbariyekê dide pêş. Em dikevin sedsaleke nû lê



Noam Chomsky


gelê kurd ê Tirkiyeyê ji bo derbirina nasnava xwe û parastin û bipêşbirina çand û toreya xwe nekarî ku teminateke qanûnî bi dest bixe. Abdullah Öcalan wekî qurbanîyê gira dewleta tirk a li hemberî herxwedana gelê kurd hatiye neqandin û bi vî awayî jî bi birdoza fermî û zimanekî nijadperest agirê rikê hate herba kirin. Darizandîna şekî ya yekalî ya şerê li Tirkiyeyê nikare pirsgerêka çareser bike. Bi rastî ev qêrînên ku li ser xwina Öcalan çêdibin, ji bili bilindkirina asta rik û gira di navbera kurd û tirk de û mezinkirina tehdîta kurbûna bêbawerîya bi aştîyê bi kêrî tiştekî nayê.

Em dixwazin ji vê riya ne-qanûnî û zorbaz a li ber çavên cihanê hate kirin yekser bê vegebin. Ev bûyerên der barê revandina birêz Öcalan de bi her awayî û li ber çavên raya giştî were zelalkirin; di zûtirîn katê deztir were dayîn ku parêzerên Öcalan û heyetek ji doktoran bikarin herin serlêdana Öcalan; birêz Öcalan divê li gori pîvanên navneteweyî û nirx û prensîbên mirovî were darizandin; ji bo vê jî divê derfetên bînan dayin ku çavdêrên navneteweyî li hemû danîşinên dadgehê amade bin; Tirkiye divê cezayê mirinê rake û vî cezayî li hemberî birêz Öcalan wekî tehdîtekê bi kar neyîne. Ewropa divê hemû qanûn û prensîbên xwe yê koçberî û penaberiyê mîna yê din bi awayekî dadyane ji bo daxwaza penaberîya siyasî ya birêz Öcalan jî bi kar bîne. Di dawîya de em ji we piştigiriya vê bangê dixwazin ku ji bo çareserîya kêşeya kurd konferansekê navneteweyî bicive û gotûbêja her du aliyan dest pê bike.

PERWER BENGÎ /ALMANYA

ÇAVDÊRÎ

Çalakiyên kurdan û Ewropa



MİRHEM YİĞİT

Ji hatina Rôma û vir de ji Serokê pê ve tiştek ne di bala me de ye. Serokê ketiyê roj û şeva me mijûlahî û sohbetên me li ser çî bin, çilo dest pê bikin, dawî vedigerin ser Serok. Di xewnên me de ew heye û her gava em bixwazin du du gotinan bêjin, çend rêzan binivîsin ziman û qelem me bi aliyê wî de dehfê dîkin.

Ne em tenê wiha ne, bêj hema giş gelê kurd çende ewqasî wiha ye, em nagihên toza dayik, xwişk û xortên kurd li derve, ew çend mişwaran li pêşiya me ne.

Ev zêdeyî sê mehan e bûye hewar li Ewropa. Zengilê alarmê li dar e. Rengê seferberî rabûye. Gelê kurd bi hûr û girên xwe, bi kirmansahî, silêmanîyeyî, qamişloyî hu bakuriyên xwe, bi kurdên Lubnanê, Sovyeta Kevinû yê Enedolê di nav meşan, sermîner û civînan de roj li wan derdikeve û diçe ava.

Li her derê qêrîn e. Her der diheje, dizinge. Kolan, gasîn û daîreyên Ewropa bi kurdan çelq û pêl didin. Ewropa û ewropayîyan ji sala 1968'an û vir de tiştên wiha nedîtine, nejiyane.

Çalaki herojî, bêrawestan û berdewam in. Kurd nizanin west çî ye, rûniştin hew tê bîra wan, hêrs û agir ji wan dibare. Komploya li dijî Serokê qebûl nakin, nikarin hezîm bikin, ji wan er gelekî giran tê û wek çavsooriyê sedsala me dinirxînin.

Herkes dibê Apo û ne tiştekî din. Gelê dilşikestî be ji tîkoşer e, bi biryar e û wa xwiyaye dê çucarî dewlet û deshelatdarên tirk efû neke.

Şik û guman tê de tune ku ev kirasê komplogêrên navneteweyî ji kurdan re ditefîsinin dê kurd li xwe nekin û çarenûs û statûya ku ew ji kurdan re layiq dibînin ew dê zîvarzîvarî bikin. Tiştê niha kurd dîkin li derve û li hundur ev e û ji vî pê ve ne tiştekî din e. Dîroka Kurdistanê hinekî ji dîroka lidarxistinê komployan navneteweyî ye li dijî gelê kurd. Komployan sedsalên 1800'î û yê Mehabad û serdema Barzanî, berxwedan rawestandin, li paş xistin û heta bi cihêkî ji bo demê be ji bi ser ketin. Lê komploya li dijî Serokê herçendî pir mezin e û sedsala me komployan din bi vî tewrî nas nake jî, ne her bi tenê nikaribû xebatê saniyekê jî bisekinîne û bigihê hedefa xwe, herwiha xebatê gur û germtir kir, çend zewrên din li yekîtiya kurdan dan û xwêziya kesên li paş vî komployan jî di qirika wan de hişt.

Heftê û mehên li pêşiya me dengê kurdan dê berdewam neteweyîtir û navneteweyîtir bibe, dê bêhtir bête bihistin û ev deng teqez dê li ewropîyan jî bandorê bike. Pirsê kurdan êdî bûye pirsê ewrûpî. Zêdeyî milyonek kurd li vir dijî, ewrûpî nikarin wan nebînin û mesela wan mîna berê di ser guhên xwe re bavêjin. Her ji niha ve mirov dikare bibîne ku Ewropa hêdî hêdî dibe dudo:

Ewropa li dijî kurdan û ya bi gelê kurd re, ango Ewropa serokwezîr û deshelatdarên û ya şexsiyeten mîna xelatgirê Nobelê Dario Fo, rejîsorên mîna Francesca Arcibugi, nivîskarên mîna Harold Pinter û Arthur Miller.

Rastkirin: Di quncikê nivîskarê me Mirhem Yiğit ê berî vî de ji ber xeteyê teknîkî di şûna wêneyê wî de, wêneyê Bekir Şiwani derket. Ji ber vî em jî nivîskarê xwe û xwendevanên lêborînê dixwazin.

Nivîskar Mahmut Baksi:

‘Hatt-i mudafa nîn e, sa

NECATI BOZKURT

Kurd di demeke gelekî nazîk de ne. Di vê serdemê de barê ku dikeve ser milê nivîskar û rojnamegeran çi ye?

✓ Di vê qonaxê de bi taybetî rojnameger divê dengê gelê xwe, hem jî li ser navê gelê bigihîne hemû cihanê. Dijmin qesta dîl û seriyê me dike lewre di vê demê de tu maneya bêdengiyê nîn e. An jî tu qîmeta çiroknivîsîn û nûçenivîsînê tune. Gelekî şerm e û li dijî gelê kurd gunehkarî ye. Di vê qonaxê de divê her kes dengê xwe bilind bike. Çi jê tê bike û bêyî tîrsa mirinê binivîse û bipeyive. Heke na dev ji nivîskarî û rojnamegeriyê berde, here ji xwe re pizzafiroşî û lahmacûnfiroşiyê bike! Dema tu xwe wekî nivîskar û rojnamegerê/e kurd bihesibîne, ji kerema xwe re wekî lahmacûnfiroşekî nefîkire! Ne ku ez lahmacûnfiroşan biçûk dibînim.

Bila êdî li darê dinyayê navê rojnamegeriya kurdî jî were hildan. Ma hûn li hêviya çi ne? Rewşa çapemeniya kurd darî çavan e. Min tu rojnameyên wekî tirkan şoven, çepel û derewîn nedîtî. Lê ew vê jî dibêjin: “Dema behsa welat dibe, çi rastgir û çi çepgir hemû rojnameyên me dibin yek.” Bila hinekî jê sûd û dersê werbigirin. Bila li benda serê Apo nemînin. Dev ji kurdê zindî berdî, êdî sebra tirkan bi kurdê mirî jî nayê. We ew hovîtiya li Antalyayê dît. Êdî miriyê kurdan jî li welatê xwe nahewînin.

Niha ku em bêjin: “Niha berê Apo û Mahmûd Baksî wisa gotibû. Ez ji ber wê yekê qehirîme.” Gelekî şerm e. Ev dema Kurdistan ava bû, wê di pirtûkên serpêhatîyan de bêne nivîsîn. Aniha tu çi dikî? Ez vê yekê tu caran jî bîra nakim: “Parastina çeperî tune, parastina welat heye! (Hatt-i mudafa yoktur, sathî mudafa vardır)”

Li aliyê din tu nema dikarî bibêjî, ez rojnamegerê/e başûrî nizanîm bakurî me lewma ez dê tenê vê derê biparêzim. Divê em dev ji van eletewşîyan berdî. Divê nivîsîn te xitabî hemû kurdên cihanê bikin.

Bi baweriya we nivîskarê/a baş kî ye?

✓ Bi peyvekê dibêjim: Yê ku xizmetkariya doza neteweyî dike.

Baş e. Hûn baweriya xwe bi dîtina Ronasansa Edebiyata Kurdî tînin?

✓ Hûn pê zanî di navbera salên 1925–1970’yî de zimanê kurdî şkestên dijwar û giran xwarin. Hatibû qonaxa ber mirinê. Jixwe me jî digot: “Kuro! Ne zimanê ne jî dîroka me heye?!”

Li aliyê din ronasansa kurdan di salên 1970’yî de piştî koçberiya bo Ewropayê

rû da. Ronasansa zimanê kurdî 12’ê adarê sala 1971’yî ye. Li Ewropayê ji qonaxa devkî derbasî qonaxa nivîskî bû. Lê ew kaset? Stran û çîrok ketin kasetan. Li darê dinyayê tu gelan wekî kurdan fêde ji kasetan negirtiye. Ew kaset, pirtûkên me yê herî hêja ne. Lewre stêrka zimanê kurdî bilind bû û kete defteran. Êdî dîrok jî nikare zora zimanê kurdî bibe!

Yek jî, divê em tiştêkî ji bîr nekin. Her çend me dibistan nîn e jî, me dayik heye. Dayikên me hem pedagog, hem psîkolog û hem jî zimanzan in. Lewma li ba min her dayika kurd romanek e. Divê mirov destên wan maçî bike!

Gelo şoreş û edebiyat çendî bi hev re dimeşin?

✓ Min divê li xwe mikur werim. PKK’ê di nav de rêxistinên me di serî de zimanê kurdî zêde bi tiştêkî nehesiband. Ev rastîyeke dîrokî ye. Her tiştê wan bi tirkî bû. Min li dijî wê yekê gelekî şer kir û min êş û azareke giran jî kişand.

Li Swêdê, dewletê mafên perwerdehiya bi kurdî da kurdan lê di serî de serok û sekreterên giştî jî dibistan û zarokxaneyan zarokên xwe hilandin. Min navê navên wan hildim. Gelê kurd wan nas dike. Kuro tu çima zarokên xwe ji dibistana kurdî hiltîni? Gel dişîne, ma tu çima naşîni? Li nav çavên me nihêrîn û gotin: “Bila pêşeroja zarokên me nekeve nava talûkayê. Jixwe dema Kurdistan ava bû, dê ev mesele biçê serî.” Lê piştê bêguman zimanê kurdî û şoreşa kurdan bû yek. Bi derengî pêk hat lê bûn yek. Êdî şoreşa kurdan di xizmeta zimanê kurdî de ye lewre ji tu mesrefan danexwe. Tev darî çav in: Televîzyon, radyo, rojname, kovar hwd. Me xeyala wê yekê nedikir. Ev yek bi zora zimanê kurdî hate pê. Ev jî resenî û xurtiya zimanê kurdî nîşan dide.

Ez naxwazim raberzîm çepgirên tirk lê wan kir ku zimanê kurdî 30 salin di şûn de bimîne. Heke me girîngiya ku dabû weşanên çepgirî bidaya zimanê xwe, wê aniha weşangerî û rojnamegeriya me di qonaxêke baştir de bûya.

Hûn dikarin hinekî behsa pirtûka li ber destê xwe bikin?

✓ Min divê her dem bi kurdî binivîsim. Lê şert û merc rê nadin wê yekê. Lewre mirov carinan ji bêgaviyê bi zimanê dagirkeran jî dinivîsî, da ku tu derdê xwe bi gel bide fêmkirin.

Navê pirtûka min a ku wê derkeve “Her kuş kendi sürüsüyle uçar (Her Teyr bi refê xwe re difire)” Ev pirtûk peyre de bi kurdî bê weşandin. Di vê pirtûkê de ez behsa bûyerên 30 salan ku min bi çavên serê xwe dîtine, dikim. Hêvîdar im wê tendirustiya min bihêle ku ez vê pirtûkê bibim serî. Lê min haziriya xwe kir.

Lewre min serpêhatiyên xwe hilandin 78 kasetan.

Ji bo nivîsîna wê pirtûkê ez xwe deyndarê gelê kurd dibînim, da ku xwe bidim efûkirin. Jixwe minê di wasiyetnameya xwe de bigota bila kes neyê ser gora min. Lê piştî wê pirtûkê ez wê yekê dibêjim. Bila werin li ser gora min kulilkan deynin. Ev ne tiştên hîsî ne, rastî ne. Bila her kes binivîse. Lê yên ku dinivîsin, bila tiştên dizanin binivîsin. Pîraniya wan tiştên ku nizanin dinivîsin.

Hin nivîskarên kurd hîna bi tirkî dinivîsin. Hûn vê helwesta çawa dinivînin?

✓ Jixwe ger bi kurdî dizanin û pê nanivîsin, ev şermeke mezin e. Nayê efûkirin. Ger wan kurdî jî bîra kirine û ji bo hîn bûne naxebitin, ev jî hemû şermezariyan jî girantir e. Lê dema ku doza kurdan û serpêhatiya keça kurd a 18 salî, ku guleya xwe ya dawî di xwe de diteqîne, tîne ser zimên ne xem e. Bila bi her zimanî binivîse.

Baş e. Çima ez bi taybetî pî didim ser zimanê kurdî? TC tîkilî kinc û xwarinên me nabe û bombeya atomê navêje ser me. Lê TC qesta zimanê kurdî dike. Lê li aliyê din gelek kurd di warê edebiyat, rojnamegerî, sînema hwd. xizmetkariya zimanê dagirkeran dikin. Di vî warî de qayişê dikşînin û ji bo “tirkiyeke xweşik” hewl didin xwe. Tu dibê qey zimanê dayika

wan e. Şerm jî nakin! Dema wekî qureyan li derdorê xwe ba bikin, gelê kurd li wan avê venexwe! Ev îro hene, siberoj kes navê wan hilnade.

Çêbû. Kîjan berhem dikevin warê edebiyata kurdî?

✓ Bi baweriya min ev berhem jî edebiyata kurdî nayên hesibandin. Yek, her çend berhem bi kurdî hatibe nivîsandin jî ku naveroka wê ne kurdewarî ye. Du, her çend kurdî be jî dema çavkaniyên jê fêde hatîye neyên xuyakirin. Sê, dema nasnameya kurdewarî jê ne xuya be.

Divê her kes van tiştan li ber çavan bigire. Lewma ez Yaşar Kemal efû nakim. Dostaniya min û Yaşar digihêje sih salin. Yê ku di sala 1980’î de Nobel li wî herimand, kekê Mahmut Baksi ye! Belgeyên wê yekê hene. Min gote wî: “Yaşar! Hay ji xwe hebe! Dema tu vedixwî, tu ji min kurdperwer dibî. Lê tu serê sibê diçî, di televîzyonên Swêdê de behsa Altay û Oğuzan dikî. Yaşar, ez bela xwe ji te venakim! Gelê kurd bela xwe ji te venake!” Min wisa gote wî lê gotinên min bi kêr nehatin. Min bi belgeyên di televîzyonên Swêdê de diyar kir ku Yaşar Kemal çendî diz û talankarê ziman û edebiyata kurdî ye.

Min navê quretîyê bikim lê yê ku Yaşar Kemal navdar kiriye ez im, gelê kurd e. Gelê kurd demence da min, min jî tetikêşî kir.



i mudafa heye!

Tê gotin ku heya îro romana gerîla nehatiye nivîsîn. Hûn jî di vê baweriyaya de ne? Sedemên vê yekê çi ne?

✓ Ez ne di vê baweriyê de me. Dîtinê 'romana kurdî nîn e' eletewş û bêvac e. Lewre tu romanên Erebi Şemo di ser guhê xwe re diavêjî. Erebi Şemo bi rastî jî romanên tîkûz nivîsîn.

Wekî din kurdên bakurî, bes bakurê Kurdistanê wekî Kurdistan dibînin. Qet bala wan ne li ser parçeyên din e. Her wiha divê em bi tenê kurmançî wekî zimanê kurdî nehesibînin. Gelo bi zaravayên din çi berhem hatine nivîsîn? Ez jî pê nizanîm. Ev şermezariyeke mezin e.

Ez gelekî şermezar û stûxwar im. Tiştên ku hatine nivîsîn, ew qas hindik in ku devê min lê nagere ez navê wan jî hildim. Her wiha devê min lê nagere ez bêjim; ku cara ewil bi herfên latînî romana Mahmut Baksi "Hêlîn" bi kurdî derket. Ev cihê şermezariyê ye. Ango ku mîlad wê demê dest pê dike, ev lixwemkurhatineke gelekî dijar e.

Piştê em hez jê bikin an na Mehmet Uzun rabû. Ew berhemên baş dinivîse. Ma kêmasiyên wî nîn in? Yê me hemûyan hene. Bo nimûne, dema yek romana "Gundikê Dono" wekî roman nehesibîne, ev hem jî bo min û hem jî ji bo romana kurdî heqaret e.

Îro romana kurdî li dar ketiye lê têrê

nake. Gelekî kêma in. Heya îro diviyabû bi sedan roman bihatana lê kirin. Di navbera salên 1975-1998'an de li bakurê Kurdistanê romanek nehate nivîsîn. Ma kî dikare vê bîne ser zimên?

Xwezî di vê pêvajoyê de ez li Diyarbekir bûma. Ji Mele Eliyê Unis vir de min dê romana hemû serhildanên kurdan binivîsanda. Ma Mahmut Baksi gerîla bêroman dihişt? Ji bo ku mirov bikaribe li ser gerîla binivîse, divê bibe gerîla. Kêmtirîn divê mirov du-sê salan tevî gerîla bijî. Divê tu gerîlayê/a ku li ser destê hevalê xwe jiyana xwe ji dest dide bibînî, da ku tu bikaribî romana gerîla binivîsî. An na dema tu li Stocholmê wekî axa û şêxan xwe bispêrî quncikekî û lingên xwe biavêjî ser hev, tu nikarî romana gerîla binivîsî. Lê di vê yekê de bi qasî min, ên ku ez dawet nekirim jî sûcdar in. Bi qewla İbrahim Tatlıses "Ma wê li Harranê zanîngeh vekir ku me nexwend!" Kijan tevgera kurd ez dawet kirim ku ez neçûm? Wê demê ez li ser xwe jî bûm û her kes pê dizane ku Mahmut Baksi "heta heft bavê xwe nivîskarekî neteweyî ye". Her wiha wekî nivîskar di warê zimanê kurdî de darî çavan bûye. Heye ku hin kes bêjin Mahmut Baksi xwe diparêze. Na. Ez xwe bi dijarî sûcdar dikim. Tuyê jî çiyê re bêjî 'were, were, were'. Dema çiya neyê, divê tu berê xwe bidî çiyê. Min ev yek nekir. Lewma ez deyndarê Çiyayê Agirî me. Bîst salan hişê min ji ser min çûbûn, min Çiyayê Agirî biçûk hesaband û min gotê: "Were, were ba min!" Lê çiya? Ma çiya qet avê li mirov vedixwe!?

Mebesta min tevgera kurd ku ji 1984'an rabûbû. Bi taybetî tê gotin ku romana kesên ku êgir berdidin canê xwe, çalakîyên xwe fedaiyî pêk tînin, nehate nivîsîn?

✓ Di vî warî de ez mit û mat dimînim. Ez rojnivîskên (günlük) gerîla dixwînim. Piraniya wan bi tirkî hatine nivîsîn. Ev jî bo romanûserên kurd alavên bêhempa û yekta ne. Camêr! Dil, evîn û doza xwe daniye ser sêniyeke zêrîn rabeftî te kiriye. Heta tu ji xwedê bixwaze agahî û malzeme heye! En ku ku rojnivîskên gerîla bixwînin, dikarin du sed romanên jî binivîsin. Lê kesî jî wan fêde wernegirt. Divê em şerm bikin. Ez şerm dikim. Her çend min di navbera 1980-1990'î de bi kurdî roman nivîsîn jî lê ez wan salan ji jiyana xwe nehesibînim. Min nekaribû biçim ba gerîla lê gerîla her roj dihate mala min. Mahmut Baksi rûne ji xwe re rojnivîskên gerîla bixwîne! Jixwe camêr ji te re roman nivîsiye. Tiştêkî tu bikî çi ye?: Bo kurdî wergerîne û sererast bike. Ma li darê

dinyayê kijan gerîlayan li pey xwe ewqas malzeme hiştiye? Ewqas serbilindî û şanazî hiştiye? Ku ev roman nehatiye nivîsîn, ez kesî wekî nivîskar nehesibînim. Ev bîst sal in şerekî dijar û çepel li dar e. Ez bo nivîskar û rewşenbîrên kurd dibêjin: Ger em roman, film, şano hwd. vî şerî nenivîsin, em dê neşuştî biçin!? Em dê deyndar û neşuştî biçin! Gelê kurd wê nema navê me hilde. Lewre em hemû sûcdar in. Ma kijan gel li xayin û sûcdaran xwe xwedî derketiye? Gel, li kesên ku kul û keserên wî tînin ser zimên xwedî derdikeve. Hêvîdar im wê nîfşên nû guh bidin ser gotinên min û wekî me nabin deyndarê gelê kurd. Em ewqas deyndar in ku, em nikarin faizên deynê xwe jî li gelê kurd vergerînin!

Romana Video Gelin...Kê û çi kir ku hûn vê romanê lê bikin?

✓ Pirseke xweş e. Xirecîreke mezin rabû. Heta ez bi mirinê tehdît kirim û gotin: "Ma tu çawa sir û razên pîroz ên gelê kurd eşkere dikî! Wê dijmin keysa xwe lê bîne!" Ez lê fikirim û gihiştim vê baweriyê: Dijmin tu caran vê romanê li dijî gelê kurd naxebitîne. Lê yên ku li ser navê gelê kurd mafê penaberiyê dixwazin û peyre wekî qeşmeran rûyê xwe ji gelê kurd badidin, dê keysa xwe li vê romanê binin. Ev pirtûk, kesên ku keçên kurd dilewitînin rabeftî dike. Çavkaniya wê nava dilê jiyane ye. Di binyata xwe de romaneke dokûmanter e.

Min behsa wan kesên rûreş û çepel kir. Ew kesên ku li ser navê gelê kurd hatin Swêdê û piştî ku çend qurîş peyda kirin, çûn li Stenbol û İzmirê jî xwe re havîngeh kirin. Van kesan ku dêvla ku cara pêşîn doza kurdan bixin rojeva Parlementoya Swêdê û hîn zimanan bibin, berî her tiştî dev ji jinên xwe berdan. Di nava atmosfera azad a Swêdê de û di nava zeriyan de yekser bûn swêdî! Îro li Swêdê bi hezaran jinên kurd tevî zarokên xwe di nava jiyaneke cehennemî de ne. Min dil kir, ez kul û keserên van kesan binim ser zimên.

Yek jî romana min gelekî xurt e. Romaneke bi namûs û realist e. Romana kesên ku li ser navê gelê kurd sextekariyê dikin e. Romana jina ku di nava çar diwaran de porê xwe spî dike û "Mêrê min li ku ye?" bide aliyekî, dibêje "Zarokê min li ku ye?" Jixwe civaka swêdî malik lê mîrat kiriye, di ser de jî mêrê wê dev jê berdaye. Ka xwe li cihê wan bihesibîne! Piştî vê yekê jî tu perena bigihîne hev û bi wan pereyan xwe wekî mafparêzê jinan bide pêş!? Ev cinayeteke civakî ye! Bêguman karê min jî nivîsîna vê yekê ye.

Min tu rojnameyên wekî Tirkî derewîn nedîtîn. Lê ew dibêjin: "Dema behsa welat dibe, hemû rojnameyên me dibin yek." Bila kes li benda serê Apo nemîne. Dev ji kurdê zindî berdîn, êdî sebra tirkî bi kurdê mirî jî nayê. We ew hovîtiya li Antalyayê dît. Lewre "Hattî mudafa nîn e, sathi mudafa heye!"

Ji bo ku mirov bikaribe li ser gerîla binivîse, kêmtirîn divê mirov du-sê salan tevî gerîla bijî. Divê tu gerîlayê/a ku li ser destê hevalê xwe jiyana xwe ji dest dide bibînî. Nexwe dema tu li Stocholmê wekî axa û şêxan rûnî, tu nikarî romana gerîla binivîse.

Dostaniya min Yaşar digihêje sih salan. Min gote wî: "Yaşar! Hay ji xwe hebe! Dema tu vedixwî, tu ji min kurdperwer dibî. Lê tu diçî, di televîzyonên Swêdê de behsa Altay û Oğuzan dikî. Yaşar, ez bela xwe ji te venakim! Gelê kurd bela xwe ji te venake!"

Tu nema dikarî bibêjî, ez rojnamegerekî/e başûrî nizanîm bakurî me, lewma ez dê tene vî parçeyî biparêzim. Divê em dev ji van eletewşiyên berdîn. Divê nivîsên te xitabî hemû kurdên hanê bike.



Mahmut Baksi ligel hev tîn dîtîn.

Nameya Qadafi bo gelê kurd:

Dîrok bi wan dikene!

Ji bo birayên me yên tirk, ez dixwazim bibêjim; xwe nexapînin û sermest nebin. Ev tiştê hanê dide xuyakirin ku hûn dîroka welatê xwe nas nakin û xwe bi serketineke derewîn dixapînin. Ji ber ku Stenbolê herî vê jî bi jêkirina serê Xoma, Evdîlcelîl, Yehya Swedî şahî kiribû.

Osmaniyan ew anîbûn Stenbolê û gotibû: "Ew kesê ku serê xwe hildane, doza serxwebûna Libyayê dikin. Me ew şênandin. Wê Libya heta hetayê di bin destê me de bimîne." Lê dîrok îro bi wî mêjiyê wan dikene. îro Libya, dewleteke serbixwe û serfiraz e. Ew bi wê kêfa xwe, xwe dixapînin. Piştî wê Stenbolê dilşad bû û got: "Berxwedanên ereb û têkoşerên ereban hemû hatin şênandin û temirandin." Wekî Evdîlkerîm El Xelîl.

Evdîlhemîd El Zehravî, Şikrî El Esevî, El Xetîb û Selîm El Cezayîrî we emîr Omar El Evdîlqadir El Cezayîrî...hwd. Ew kesên ku dadgeha Stenbolê hikmê îdamê di heqê wan de dabû. Ji ber ku wan ji bo serxwebûna welatê xwe xebat dikir. Îro em dibînin ku welatên ereban wekî Iraq, Sûriye, Filîstîn hemû serbixwe ne. Lê yê tîk çûye, dewleta Osmanî bi xwe ye. Ew xwe dixapînin û dîrok bi Stenbolê dikene. Bi kuştina wan şoreşgerên neteweyî nekarîn astengê bixin pêşîya serxwebûna milletê ereb. Îro rewşa Abdullah Öcalan, her çiqas ez wî nas nakim û tîkiliya min bi partiya wî re nîn e (Tirkiye jî vê yekê baş dizane) tiştên bi vî rengî berî niha jî çêbûn. Dema ku şoreşgerê ereb welatparêz Nexil El Mutran bi awayekî çav û dest girêdayî birin Dîyarbekirê û di rê de leşkerên tirkan ew kuşt, dîsa Stenbolê şahî kir û got: "Bi kuştina wî eşqiyayî, me dawîya serhildana ereban anî." Bes îro welatên erebî hemû serbixwe ne.

Ji aliyê din, ez dixwazim ji bo birayên xwe yên kurd jî tiştina bêjim. Di vê demê de netirsîn, xeman nexwin. Dijminê we çiqasî xwînê birijîne, ew benzîne li agirê şoreşa Kurdistanê dike. Berdewama rijandina xwîna wan, geşbûna agirê şoreşa serxwebûna Kurdistanê ye. Nedana mafên gelê ku ji bo serxwebûnê tê dikoşe, nezani ye, şovenîti ye û dîrok nezani e. Li dijî zordar û stemkaran serkeftin ya we ye û ji bo we ye. Ev împaratorên şer wê bişikên, çawa berî niha împaratoriya Osmanî şikest û şoreşgerên ereb bi ser ketin. Îro, dîrok bi wan dikene û bi Stenbolê jî dikene.

Ji bo wan dewletên ku alîkarî kir bo girtina serok Abdullah Öcalan, tiştê hindik ku ez bêjim wan, dewletên tirsonek in, bêexlaq in û bêwijdan in. Tevahiya hêza xwe li dijî kesekî kirin yek, beramberî rişwet û berjewendiyên nemirovane. Divê bi wan dewletan re pêwendî nemîne. Ev karê ku kirine karê tirsonekan e.

Ya dawî, berdewama şer heta serxwebûna birayên me kurdan e.

Têbinî: Ev nivîs ji hejmeta kovara El-Wetan Erebi ya 11-47 hate wergertin.

Ji EREBÎ: B. SEMÎR



Nameya Muammer Qadafi bi xwe re, her tiştê dîrokê, her tiştê neteweyî serdestên li baş nîşan dide. Osmaniyan gelek pêşengên fevgerên ereb û dest û çav girêdayî "antî Stenbolê" bi çeteyane qetl kirine. Lê wekî Muammer Qadafi dibêje, ew gel hemû niha xwedan dewlet in. Her wiha kenê mirriyan bi 'Wan' tî...!

Têbinî: Em dê beşên nivîsa Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ya bi navê "Di şoreşê de wêje û rewşenbîr" di hejmarên din ên rojnameyê de biweşînin.

Nameyek ji Wî re:

Dilê te dê gişan hilîne!

Rojeke germ. Kî zane ji kîjan dilî derketibû û diket kîjan dil. Rojeke germ zivistan qewirandibû. Tev ba û bahoz, tev berf, baran, tev kul û birînen xwe qewirandibû. Rojeke germ, di bêhngul û beybûn, kulîlk û rîhan. Bi bêhna Kurdistanê.

Lê ji nişke ve ba rabû. Sermaya ku di tûrikê zivistanê de me bû, belav dikir. Ba rabû...! Bi lorîn, lorînek pir nas. Car caran ber guhan ketiye. Lê êdî ji bîr bûye û kes nexwaze bibihîze. Qet nexwazin. Çi dibê bila bibe. Lê ne ew lorîne. Bi ken bûm ez jî bi şagirtan re di şahiyê de. Keçeke ciwan a şagirt bû mêvanê min. Bi kerb û xezeb. Bi lez. Bi hêsrên çavên xwe lorîn anî bîra min. Mîna bê. Jêmahrûmtîr, jê bêkestir. Çi dixwest tu zani? Çi dixwest...! Dixwest ku ez jî bigirîm digel wê. Bêkestiya xwe bi min biborîne. Dixwest ez, ew û ba bi qerîn bilorînin. Bigirîn û bilorînin. Çi û çî ji ser zimên diherikin tu zani? Bêkestî. "Bêkestiyeke Kurdistanî" Şewat, mirin, bêhêvîbûn. Tu bûya te yê bigota çî?

Na na...Berî her tiştî na. Erê, "na". Min jî got; na. Ne te digot: "Bêkesiyeke Kurdistanî", "Berxwedaneke Kurdistanî" te yê ev bigota û tu vê dibêji: "Jixwe ev yek bû. Te dixwest ev bigotî da û ev çêbû."

Deng tene te? Her aliyê Kurdistanê

Na na; ji her aliyê çîhanê, dengê silavan tê te?

Dengê berxwedan û serhildanan

Wekî ku dilê te dixwaze. Qet kes nalarîne. Tenê stranekî dar e, wekî ku tu dixwazi. Stranek tê gotin. Straneke kurdî. Ji bo ku lorîna bê bimire. Tu jî hez ji vê stranê dikî ne? Erê, tu jî jê hez dikî. De ka em tev de bêjin.

"Yara min yeke rind e

Delal e poz bilind e

Bi xwedî û xwedan e

Navê wê Kurdistan e"

Mizgîna min li te! Edî "xwedî heye xwedan jî". Dengê silavan tene te? Ji her aliyê Ewrûpayê. Ji her aliyê Kurdistanê. Filîstîn hezretê dilê xwe dişîne. Lubnan jî. Lê Filîpîn? Te qet ji me re behsa Filîpînê nekiribû. Berî te me hembêz kir silavên wan. Lê Romayê Careke din dişewite Roma. Li xwe dixê. Dike nalin, dike axîn. Bêriya te dike. Xwe dixemîfîne. Roma dibêje: "Berî her çîhî, diwê li cem min bibe mêvan."

De te bêhna xwe stand. Hembêza xwe veke, dilê xwe î mîna behrân fireh, dilê xwe veke. Hembêza xwe; ji ber ku Qazî Mihemmed rabû. Şêx Seidê Kal, Seyîd Riza. Kî û ranebû mal Mezlûm û Egîr, Xeyrî û Kemal, Melayê Cizirî û Ehmedê Xarî, Rehşan û Bêriyan. Qeladiz rabû Qeladiz. Amûd û Helebçe, Ammed û Mahabad... Hemû şêhidên kurd û Kurdistanê ji gorên xwe rabûn. Hembêza xwe veke. Dilê te tevan distîne. Cihê gişanê te de heye! Em pê zanin...

Qazî, çar çira di destan de bi hezaran tînan bi lez. Ji Qeladizê zarok rabûn hatin Helebçeyê. Ji hembêza dayikên wan a germ derxistin hevalên xwe. Devê wan di pêşîrên xwedayî de. Ew jî tînan, bi lez. Hembêza xwe veke.

Wekî ku dilê te dixwest. Lê dijmin? Tu yê pîrsa dijmin jî bîkê Tîrs... tîrs û dîsa tîrs. Ji ber ku te got: "Ez hez dikim!"

û tiştêkî din jî. Nabe ku ez nabêjim. Li Başûr li Başûr jî Serhildan e. Ez jî te re bêjim, bê çî slogan hatine qîrandin. Ji dil ha... Ji dil safî. Ji ber ku gel bû, ezê bêjim:

"Bakur, Başûr, Robjilat Apo Serokê Welat!"

Ma hê çî...?!

GOLWAN EVÎN

Navenda Çanda Mezopotamya ya Îmîrê

● 13.03.99 şemî:

Konsera Koma Rojhilat "Mezrobotanim Ez", saet:17.00

● 14.03.99 yekşem: Konsera Koma Rojhilat du seans, saet:

15.00-18.00

● 15.03.99 duşem: Helbest û gotübêj-Şükürî Erbaş, saet:18.00

● 16.03.99 sêşem:

Şano: "Qêrîn Bê Deng" (Ji bo bîranîna Helepçe) Şanoya Hêvî,

saet:18.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li YÇKM'ê

● 14.03.99 şemî:

Filmê Levis Milestone "Mişk û Mirov", saet:16.00

● 14.03.99 yekşem: Bîranîn:

Program: Muammer Kelencioğlu, Grup Munzur,

Koma Folklorê ya Yeldaği, Danîşana Diayê,

Malbatên şehîdan û xizmên girtiyan, saet:15.00

● 19.03.99 m:

Filmê Hektor Oliverio "Şeva Pênûsan", saet:19.00

Di Roja Jinên Kedkar de çalakiyeke jinên kurd

Kermesa berhemman bû



Ji bo Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê 8'ê Adarê, jinên kurd ên li Îzmîrê çalakiyên cur bi cur li dar xistin. Yek ji van çalakiyan jî li NÇM'ya Îzmîrê lidarxistina kermesê bû. Kermesa ku girêdayî Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê hate vekirin, ji aliyê jinên Îzmîrê ve eleqeyek baş dît.

Jinên kurdan ku ligel hemû astengiyan bi awayekî girseyî 8'ê adarê pîroz kir, li Îzmîrê piştî çalakiyên xwe yên derve, beşdarî çalakiya ku li Navenda Çanda Mezopotamya hate lidarxistin bûn.

Ev kermesa ku bi temamî ji berhemên ku bi destan hatine çêkirin, ji aliyê xebatkarên NÇM'ya Îzmîrê ve hate lidarxistin. Di kermesê de berhemên wekî patîk, gore, laçik, tentene, xawik (yazma) nexş û gelek tiştên bi vî rengî cih girtin.

Jinan di vekirina kermesê de, di serî de ji bo şehîdên şoreşê deqîqeyek rawestîna rêzgiritê pêk anî. Piştî rêzgiritinê, xebatkara NÇM'ê Ayten Çaçan axaftinek kir. Çaçan di axaftina xwe de bi kurtayî li ser wateya rojê sekinî û agahî dan beşdarên. Xebatkara NÇM'ê Çaçan di axaftina xwe de li ser têkoşîna jina kurd sekinî û wiha got: "Jin di nava civakê de di bin bandora koletiyê de ne, ji bo vî yekê jî têkoşîna jinê gelekî girîng e." Wê derheqê têkoşîna jina kurd de bal kişand ser xalên gelekî girîng û got ku jina kurd ji sala 1978'an vir de di nava artêşê de cihê xwe girtiye, îro têkoşîna xwe derxistiye asta herî bilind û têkoşîna xwe bi êgir berdewam dike. Çaçan li ser şexsiyeta jina kurd şehîd Zîlanê jî se-

kinî û got ku Zîlanê li hember pergala zordestiyê xwe kiriye bombe û teqandiye. Çaçan di dawiyê xaftina xwe ya derheqê rojê de da zanîn ku sala îsal ne salek ji rêzê ye û xwest ku jina kurd ji her demê bêhtir sala îsal li dor sazî û rêxistinên xwe bicive û li saziyên xwe xwedî derkeve.

Piştî axaftina Çaçan, Koma Kendal a folklorê ku ji jinan pêk tê derket ser sehneyê. Koma Kendal listika herêma Mêrdînê list û rengekî teybat da çalakiyê. Dûv re Şanoya Hêvî jî bi listika xwe ya bi navê Zîlan derkete pêşberî temaşevanan. Şanoya Hêvî di listika xwe de li hemberî gemariya ku pergala dide ciwanan rola çalakiya Zîlanê li ber çava raxist. Piştî listika Şanoya Hêvî program, di nava tililî û çepikan de qediya. Her çiqas wê rojê bi sedan kes di bin çav de bûn jî beşdarî û coşeke mezin hebû.

Armanca danîşana keda jinê ye


Bo armanca vekirina kermesê di Roja Jinên Kedkar ên Cîhanê de, xebatkara NÇM'ê Ayten Çaçan bo rojnameya me jî daxuyaniyek da. Çaçan armanca vekirina kermesê wiha anî zimên: "Di pêkanîna kermesê de armanca me ew e ku em berhemên jina kurd ên ku bi keda destên xwe çêkirine, pêşkêşî gel bikin."

Di kermesa ku dê demekê vekirî bimîne de quncikek ji pêşangeha wêneyên jina kurd re jî hatiye terxankirin. Di van wêneyan de mirov dikare jiyana jina kurd a piştî têkoşînê, ku ji nû ve bi dest xistiye bibîne.

DAVUT ÖZALP/A.WELAT ÎZMÎR

TÎŞK

Pîroz bê yadî RAPERÎN



BEKIR ŞIWANÎ

Wek dezanê mangî adar peywendiyekî pitewî be mêjû û çarenûsî gelî kurdewe heye. Çend karesatêkî nalebar û diltezênîş, her lem mange da be serman hatiwe ke bêguman diyartirîniyan karesat û mersatî şarî Helebcey Şehîd e. Min lêre da em babete cêdêlim û dême ser bas û yadkirînewey dastanêkî bê wêney gelî kurd ke ewîş yadî raperîni beşikoy beharî salî 1991 e le başûrî Kurdistan. Cemawerî kurd têkşikani artêşî Iraqî le Şerî Kendaw da be hel zanî û rojî 5 adar destî kird be rijandî camî xezebî çendî sale be ser damûdezgakanî ew rijême da ke hemû şewazêkî girtibuwe her bo nawbirdinû gelî kurd û be erebkirdinî ew beşe girîngey niştîmanî kurd.

Hêndey nebîrd ke girî raperîni hemû xakî başûrî Kurdistanî girtewe û şewî Newrozî ew sale agirî Newroz le şarî Babagûrgûr wate le zêdî xoşewistî kurdan le şarî Kurkûk kirayewe. Cemawer hemû mestî neşey serkewtin bûn be ser molgakanî rijemî dirindey Iraq da. Cêy dax û derdêkî zorîş bû layene siyasîyekan le birî dariştinî nexşeyekî pitew bo parastinî destkewtekanî raperîni, sergermî girîni pir kirdin û talankirdinî welat bûn. Kem bûn ewaney ke bîriyan le çarenûsî raperîni û çonêti parastinî dekirde. Ta encam geşt be karesatî Rew, ew karesatey ke hendê le wijdane nûstuwekanî cîhanî le xew raperand û wîstîyan le naw komelgay nêwdewletî bê akarî ew serdeme da awirêkî bexêr le kurd û karesatekanî Kurdistan bidenewe. Belam her zû hawpemanekanî Iraq, ewaney ke êsta hewlî rûxandinî rijem deden, kewtine kar û karesatî Koç û Rewî kurdiyan perdepoş kird, ewîş leber ewey ke legal berjewendî ewan da nakok bû.

Êsta diway têperbûnî 8 sal beser raperîni pîrozî komelanî xelkî Kurdistan da ke giwî bo dezgakanî rapeyandinî hendê le hêzekanî Kurdistan radegrîn, waman dête ber giwê ke hewil dedrê raperîni wekû destketêkî siyasî layenekan bas bikrê. Em hewlane le katêk da dedrê ke ew cemawerê bo xoy raperîni xulqand hêsta zîndiwe û nek be tenya bînerî rûdawekanî raperîni û serheldan e, belkû kudi xoy xulqenerî raperîni û hêzî bizwenerî ramalîni dezga serkutkerekani Iraq e le Kurdistan. Be dilniya bûnewe delêyn hiç hêzêk natwanê rolî serekî û karigerî cemawer le raperîni da kem bikatewe. Çûnke komelanî cemawerî Kurdistan qurbanî rastewxoy reftare dirinde û namiroviyekanî rijemî Iraq bûn û her ewes bû be hoy ewey ke bilêsey agirî raperîni le maweyekî kem da hemû Kurdistan bigrêtewe.

Rastiyeke tîrîş heye ke hemû dezanî ber le dagîrkirdinî Kuwêyt la layen ragewe, rijem Kurdistanî wêran kirdibû û le encamî bekarhênanî gazî kimyayî û alawekanî ENFAL da hêzî çekdarî layenekanî le Kurdistan derperandibû. Sercem anîştuwani gundekanî Kurdistan, beşêkî kem nebê, hemû le ordugay zoremilê da kokirabûnewe. Emeş bê ûmêdiyekî way lay rolekanî gelî kurd dirûst kirdibû ke çawerê nebûn rûdawekan wa zû bêne pêş û arteşî Iraq bew şeweye le şer da nabût bêt û eman bitwanin dezga û molgakanî Baas ramalin. Em xaleş nişanî dedat ke ber le hawîn salî 1990, raperîni û serheldan le benamey siyasî layenekanî Bery Kurdistanî da nebuwe, belkû Şerî Kendaw û têkşikani arteşî Iraq bû ke ew hel û derfete zêrîney bo gelî kurd hênaye arawe.

Peywendî layenekan be raperînewe degerêtewe bo seretakanî derkewtinî nişaney amadebûnî mîlet bo teqînewe be rûy hêzekanî dagîrker da. Şayenî bas e ke radiyoy Dengî Gelî Kuridistan lew qonax da rolêkî girîngî bîni le handanî cemawer û çodaniyan bo raperîni û ramalîni dezga çepelekanî Baas. Raperîni gelî başûrî Kuridistan xalêkî geş e le mêjûy netewekeman da û dekrê beşekanî tîrî Kurdistan îlhamî lê werbigrin. Yadi raperîni beharî salî 1991 le xawenî rasteqîney raperîni, le cemawerî gelî kurd pîroz bê.

Mînamek ji bêbextiya axayan:

Serboriya Kejê û Salo

Salo xortekî dengîn bû. Digot, Qîza ku ez bigirim tune ye. "Kejê jî digot" Xortê ez bigirim tune ye, navê wan bi vî awayî belav dibe. Salo dibe "Heyran ez dibêm, ez qîzan begen nakim, vava dibê xortan begen nakim ez gere herim vê qizikê bibinim."

Salo ji mala Zor Liloyê xelkê welatê Silîva ye. Bi rê dikeve, tê dikeve bajarê Paloyê. Dipirse. Mala bavê Kejê mala Ferhan Axa ye, ji te re mala wan. Dikeve odê dibê "selam û elê kim," Elêkimî selam. Dibên Xortê delal te xêr e tu ji ku derê yî? "Dibê Wele ez digirim li îşkî." Salo mehekê du mehan li cem qehweçitiyê dike. Rojekê Salo di Sehera sibê da xwe li herem odê, siya qizikê diqelibîne. Qizikê hîna niyeta nimêja sibê neaniye.

Salo û qizikê ji serî ve li hev diqelibin, mîna Leyla û Mecnûn, li ber hev da tîk dibin, her du aşiqê hev dibin, îcar arza wan tê birin, zimanê wan kilît dibe yek ji yekî ra nikare tiştêkî bibêje. Qizikê bi çavên hêstir vedigere ser nimêjê. Salo bi çavên hêstir vegeyriya odê. Salo du sal sê sal ji bavê wê re xulamtiyê dike, dibê "Hema ez mehê carekê jî bibinim ji min re bes e." Îcar stûşkiyayî ne ji kesî re dibê, ne ji hevlekî xwe re dibê. Tam di vê demê de, Mîrê Palo tê qizikê dixwaze û bavê qizikê soza qizikê didê, wextek şûn da daweta qizikê şiyar kirin. Salo radibe ser xanî dibê; Tê bîra te daweta te kirin, roja îniyê tu siwar kirin, dane serekê siwaran, rex bendiyê hatin pêşiya te, hinekan gotin biçûkê xêr nediyê, hinekan got xwelî li serî be, hinekan got bîra nehara nehata pêşiyê. Salo bi çavê hêstir vegeyriya odê, got Axa xatirê te be ezê êdî herim mala xwe, "axa gotê Law, Salo, mal xirabo tu çima diherî te çî xirabiya me dît, tu ji boy Kejê dêmek sekinîbûy, te bigota min dikir bi qurbana te."

Salo "Axa sê sal e ez ji te ra xulamtiyê dikim, te rokê negot," tu ji ku derê yî, tu lay kê yî? te derdê min ne pirsî ezê êdî herim mala xwe. Rabû xatir xwest çû mal. Salekê sekinî, piştî salekê şûnda, Kejê ket birê. Dîsa tê bajarê Paloyê di ber deriyê Kejê re derbas dibe. Kejê û mîrê xwe li balkqonê rûniştine, xortek şimşat mîze dike ber derî re derbas dibe. Mîrê Kejê dibê, eva xortê wiha xerîb e ne ji vê derê ye. Kejê dibê vava xulamê bavê min bû. Pir şereflî ye, pir maqûl e pir însanek delal e. Pir wesf û salixê wî dide, hinek li anorê mîrê wê dikeve dibê de madem were ye, bîra were xizmeta hespê mi bike, madem tu ewqas salixê başbûna wî didî bîra were seyîsê hespê mi be.

Ê de keko tîra eşqê lê xistiye, bê çî ewê bike. Gazî dikê dibê heyran va qîza axê te yê berê pir wesf û salixê te dide, hema li hespê mi mîze ke, yê mî wî awha bidiyê, tîmara wî awha bike.

Tîra eşqê lê xistiye, bê çî ewê bike. Rabû carê tûlûmê seyîsiyê li xwe kir, çû tewlê hespê xwe jê ra tarîf kir. Salo salkekê jê ra boy xatirê Kejê seyîsiyê dike, rojekê xwe li aliyê herem ode siyê diqelibîne. Kes tune ye, dîsa li ser nimêja sibê ye, hîna teze dil şikiyayî, derdê xwe jê ra dibê:

...Lê Zeriyê, lê Zeriyê, lê Zeriyê
qedayê lê Zeriyê, belavê lê Zeriyê
Sibeye berê şefeqa sibê li me ronî bû
Stêrika sibeyê li me spi kir
Mal şewitiyê ê nizanîm

Tê eşqa dilê rezilê bengî ra
Berê te li qatîqê min û mexsedê ye
E nizanîm tu dua dikî, e nizanîm nîşîm
diki

Nizanîm tu ê çî dibê
Ez Salihê Naso

kinê Behîwan, heşasê bajarê Palo
Ewa serê çendilê çend salê min qediya
Tê ira kiriyê seyîs û xulamê xelkê

Ji aqî û sewdê
Iro ez bûme kar û gêj
Haydê de haydê gulîsora min haydê

Qonaxa me dîr e
...Kejê diwê law law de law law de law de
law law

Ser berjêro

Bi qurbana guliyê egalî geriyawo
Salo malmirato

Berê şefeqa sibeyê li me ronî kir
Stêrika sibeyê li me spi kir

Te sê sal ji bavê min re xulamî kar
Malmirato

Salekê jî mîrê min lawê Mîrê Palo ra seyîsî kir

Madem dilê te li min hebû

Kuliyê zimanê te nexwaribû serberjêro

Te rojekê ji hevlekî xwe re negot

Ez bûme jîna mîrê xirab

Ke time ber darê dergûşê

Emrê min çû kuro

Heya niha te nedigot

Te çima derengî kir

Here de here

Serberjêro de here

Bi qurbana guliyê egalî geriyawo

Eşîr giran e ez newêrim

...

Salo divê lê Zeriyê lê Zeriyê lê Zeriyê

Sibeye berê şefeqa sibê li me ronî bû

Stêrika sibeyê li me spi kir

Min sê sal ji bavê te re xulamî kir

Salek ji mîrê te re

Lawê Mîrê Palo ra min seyîsî kir

Gava çavên min

Bejna zirav, enî ûçqoran û xaziyan

Gewdeyê mezin hibêzên bûkîn

Awirê bêkewîn

Şêbiskê, şequsandî diket

Zimanê min dihate girêdanê

Malmirato

Nedigeriya

Wele min ji awirên çavên te fedî kir

Were de haydê de haydê

Şev nêzik e

Gelo qonaxa me dîr e

...

Divê Salo

Bajarê Palo min nedît çem û kani

Emê sê sal di malkî de geriyar

Bi qizitî û bi xortanî

Ava reş di çavên te de hato

Diçûn newalê jorin digeriyar

Bi wan şargan lo wî zozanî

Madem dilê te li min hebû

Kuliyê zimanê te nexwaribû

Te rojek ji hevlek xwe re nedigot

Ez bûme jîna mîrê xirab

Esni elemên dinyayê

Heba diranan devê te de nemaye

Emê min çuyê heftê salî

De kuro

Hîna tu hati seyîsiyê

Ji hespên xelkê re dikî

Malmirato

Hîna tu poşmanî

...

Salo divê Kejê wele

Bazinê di dilanî

Kilê Siphanê

Ji belêçavan meke xat

Şêbiskê şequsandî

Sê ke ser henarê rîyan bide alî

Wele emrê te mîrê heftê û heftê salî

Tu bibî diya deh zil zarok

Heba diranan devê te de nemîne

Dîsa tu ji min re çêtir

Ji qizeke çardeh salî

...

Kejê divê lawo de lawo lawo lawo de lawo lawo

Salo bengî bi min bengî

De rabe xwe girêde

Bi şal û şapikên qehwerenê

Madem dilê te li min hebû

Destê min bigire birevî

Navê min û xwe nava bajarê Palo da

Bêkêşkera bike dengî

...

Salo divê lê Zeriyê lê Zeriyê lê Zeriyê

Ez Salihê Naso me tewrî dîn im

Ezê te yê doxanê başkêşan im

Hevrişmakê min Ewê Paşayê Gergîn im

Qesasan radikam, kostek û zencîrê

tînim

Xwediyê şûrê devheşin im

Gava newal û derbendên asê bibinim

Ya hûr û pizûrê xwe ser darên benîştokan

digerinim

Ya ezê gulîsora xwe bi destê zorê direvînim

Wele haydê de haydê

Serberjêr de haydê

Qonaxa me dîr e

Wê çaxê lay Mîrê Palo dikeve hundir, Salo direve lay Mîrê Palo, Kejê digre û dest û nigê wê girê dide û davê zindan, qatixsiz hepis. Dibêje bîra bimire. Bîst û çar seetê wê tamam dibe. Salo tere ba demirciyan, kilîtek ji derê zindanê re çêdike,

şev tê, derî vedike. Kejê digre û direvîne berê xwe dide mala Hesên Paşa Axayê Çermûgê ye. Temamî welat di bin emrê wî de ye, heftê-heftê salî ye, mîrê sê jîna ye, heftekî li mala wan dimînin, rojekê Hesên Paşa derdikeve destmêja sibê. Kejê destê xwe avêtiye vî yalî, wî yalî derî zereqê. Tavê daye Kejê. Zêr li gerdenê dibiriqin. Hesên Paşa çav lê dikeve ser piştî li erdê dikeve ji xwe tere. Kejê baz da. Apo apo! Çiqas serê xwe radike çav li Kejê dikeve, dîsa jî xwe te re kaş dikin tînin davêne hundir. Kejê dizane apo pûşî berê ye, ji bo wî wer dike, Hesên Paşa çavê xwe vedike dibêje: "Eva kî ye di mala me de ye." Jêra dibêjin: "Eva Kejê ye. Salo revandiyê aniye mala me Hesên Paşa dibêje: "Gazî xulaman kin, bîra Salo bigirin bavên zindanê bîra birçiyar tede bimire, ezê Kejê mar bikim." Salo digirin devên zindanê, bîstûçar seetê wî derbas dibin, Salo kaxizek dinivîse dide destê xulama jê ra dişîne, di kaxiza xwe de dinivîse memleket, bin emrê te de ye, eyb e tu mala xwe da vê bêbextiyê biki, sibe xelkê te bike tarixan, bîra keçikê bide destê mi peyayê xwe bişîne pêşiya mi, bîra mi bikujin. Keçikê ji te re bînin.

Mektûba wî xwend, go bi Xwedê xebra wî ye, go: "Law Salo derxînin." Derxistin anîn zikê wan têr kirin. Serê rê û durban nema pêya ê xwe dan ser. Salo û Kejê ketin newalê, bala xwe danê de peya li ser rîya wan sekinîne, ban dikin divên xortê delal keçikê bihêle û here destê me nare te, em te bikujin. Salo keçik berda û ser kevirê rûnişt. Destê Kejê girtin di erdê va kaş kirin bû qîjîna Kejê û ban kir.

...

Divê lawo de lawo lawo lawo de lawo lawo

Lawo Salo mere

Lawo serberjêro mere

Bi qurbana guliyê egalî geriyawo

Hela carekê diduyan ser Keja xwe de tu vegere

Hesên Paşa mîrê sê jînan

Kalê heftê û heftê salî

Destê gulîsora te girtine

Bi destê zorê dibin terin

...

Temara mîraniyê hate Salo

Salo divê Kejê

Ez Salihê Naso tewrî dîn im

Ezê berxê mala zor Silo

Xwediyê şûrê devheşin im

Wele ezê îro

Hesên Paşa tevi komên xulam û xizmetkaran

Bi qurbana bejna zirav bikim

Ez ê dora guliyê egalî bigerinim

Şûrê xwe digire yekî dudiyar dikuje û her yek li aliyekî belav dibe. Ew jî li hespekî siwar dibin, terin mala axakî dinê. Keko ew jî dil dikeve Kejê. Salo dişînin Seyîda xezalan û para lê dixin. Salo dikujin cenzaya wî tînin malê. Kejê Serda pir digirî. Axa divê: "Heyran ez ji wî rind tir im ji wî zengîn tir im, tu çima digirî?" Kejê wextê fêhm dike, vana kuştîye, ew jî xwe întîhar dike, nagihênê mirad û mexsedê xwe

BERHEVKAR: ŞEREFDÎN SAXNÎSÎ

Ji Înstîtuya Kurdî du berhemên nû

Dewleta tirk hêvî dikir ku dê piştî komploya navneteweyî hemû xebatên tîkildarî kurdariyê rawestîne û dê kêşeya kurdî ji holê rabe. Lê ev hêviyê pûç bû û helwesta gelê kurd li hemberî vê komployê gelekî tund bû. Her wiha piştî komployê Wezîrê Dadê yê Tirkîyeyê giştînameyek belav kir û ji hêzên dewletê astengkirina xebatên çand û hunerî yên kurdan xwest, lewre hêzên dewletê avêt ser NÇM'ê û gelek kes girtin binçav, lê NÇM'ê ji bersiva wan bi kurtefilmekî xweşik da.

Her wiha Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji xebatên xwe bêwestan û rawestan didomîne û bersiva giştînameyên nijadperestan dide. Piştî komployê bi çend rojan wê du berhemên hêja diyarî pirtûkxaneyê kurdan kirin. Yek ji wan, pirtûka Siyahpûş a bi navê "Çend Xezel û Helbest" e û ya duyemîn ji pirtûka kurteçirokan "Girnewas" e ku ji hêla Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Hasan Kaya ve hatiye nivîsandin.

Pirtûka yekemîn her wekî tê zanîn berhemeke wêjeya klasîk a kurdî ye. Ev helbest û xezel ji hêla M. Reşit Irgat ve ji tîpên erebî hatine veguhestin. Di dawiya pirtûkê de jî ferhengokek hatiye danîn. Peyvên her xezel û helbestê ji hev hatine cudakirin. Ev jî xwendin û

GIRNEWAS

Hasan Kaya



têgihîştina berheman ji bo nîfşên nû hêsantir dike. Lewre xwendevan dikare peyvên ku nayên zanîn di vê ferhengokê de bibîne. Lê heke ev peyv li biniya her helbestê bihatana nivîsandin dê baştir bibûya, lewre wê demê pêwîst nedikir ku xwendevan li dawiya pirtûkê binêre.

Li ser Siyahpûş û berhemên wî pêwîst nake ku mirov tişteki bibêje, ew yek ji stûnên wêjeya klasîk a kurdî ye.

Siyahpûş

Çend Xezel û Helbest



Wêjeyên Ewropayî Kurdî ya Stenbolê

Jixwe dema mirov bala xwe didê huner û bedewiya di berhemên wî de mirov dibîne ku wî ev paye heq kiriye. Di nava pirtûkê de munacetek, 15 xezel û 6 helbestan cih girtiye. Pirtûk li ser kaxizeke bi qelîte hatiye çapandin û ji 60 rûpelî pêk hatiye.

Her wekî di serî de jî hate gotin, berhema duyemîn ji hêla Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Hasan Kaya ve hati-

ye nivîsandin. Di vê berhemê de jî serpêhatî û serboriya gelê kurd bi zimanekî wêjeyî û xweşik li ber çavan hatiye raxistin. Bo nimûne di kurteçiroka ku navê xwe daye pirtûkê de li ser malbateke ku zarokê wan dîn e û geşta wan a bo Ziyaretgeha bi navê Girnewas hatiye rawestandin. Digel bîr û baweriyên jina malbatê yên ku bêpêşdarazî hatine dayin, bêhurmetiya hêzên dewletê jî hatiye pêşkêşkirin.


Di nava pirtûkê de 19 kurteçirokan cih girtiye, ev çîrok giş jî di weşanên kurdî Welatê Me, Azadiya Welat û Jiyana Rewşenê hatine weşandin. Pirtûk ji 139 rûpelan pêk hatiye. Qada hemû çîrokan derdora Nîsebinê ye. Ji dan û standina serxet û binxetê, bigire heta karkerên pembû, jiyana şoreşgeran gelek mijaran ji xwe re di nava çîrokan de cih ditiye. Di çîrokan de zimanekî gelêrî hatiye bikaranîn û ji zimanê herêma ku bûyer lê diqewime nehatiye dîr ketin.

Her çiqas di hûnandina hinek çîrokan de piçek kêmasî balê bikişînin jî mirov zimanê li çîroka diherike û bi taybetî serpêhatiya hinek mirov kezeba mirov dişewitîne. Li hemberî serpêhatiya Eysê û Remo, Şêxmûs, mirov kelogirî dibe. Dîsa zilma neyar û şeytanokan gira mirov zêdetir dike û her wiha mirov çosa dilê şoreşgeran di dilê xwe de hîs dike.

SERWÎSA ÇANDÊ

Agirê Zerdeşt dikare vê gemarê paqij bike

HASAN KAYA



Va ye dîsa zarokên te yên dilkeçik hambêzên çiyayên te ji xwe re kirin nivînen herî birehm û bibext.

Welato wekî gelek fetlonekên dîrokê yên girîng îro jî li ser vê xaka porkur lê ya ku îro bûyê warê cegerpolayan, peyvên ku zêde zêde tene kirin bêbextî û dîsa bêbextî ye. Îro peyvên ku herî pir ji nav dilên kewandî mîna lawijan libo libo derdikevin bêbextî û çiyân in. Di ferhenga zarokên te de ev her du gotin li dijî hev in. Her kes dibêje, incex dilovaniya Sîpanê Xelatê, xezeba Zagrosan, bilindahî û tîna Agirî dikare qirêjî û dilreşiya ku ji cumle paytextên zulumkaran mîna dûxanekî reş xwe bera ser sînga welatê min dide, pak bike...

Mirovahiya ku îro mîrê wê tev çeçel, torîk û wawîk in! Carek be jî binêre li rûçikê xwe yê ku deqa qewmê Lût li ser e.

Hûn dizanin bêhna goştê beraz, berxik û mirîşkan çawa ye? Lê qet bêhna goştê laşê we yê şewitandî hatiye ber pozê we? Ey zarokên Garîbaldî, Spartakûs, Promêtûs, Gandî. Ey zarokên Mao, Che Guvara qet hêvî û xewna we ya bi sedan salan bûye nêçîrek û ketiye nav lepên moxolîyan. Tu caran rûmeta we di qefesa Bêbavan de hêsîr bûye. Ez ne bawer im ku tu mehlûqat fêm bike xweşewitandina keçên delalî. Ez ne bawer im ku tu kes bikaribe di hest û birîna we bigihîje, zarokên kuçeyên Amedê, Xaçort û waroşên Edeneyê... Bi tenê van çiyayan carekê be jî bêbextî li şervanên azadiya we nekiriye. Incex ew kelehên rûmetê dikarin bibin şîrikê kul û keserên me.

Hozano! da ka tu stranekê biafirîne. Pê derman bike kul û birîne. Geş bike rûyê xemgîn. Êdî yek stran jî tîra mezinahiya evîn û kîna me nake. Ey dengbêjo! Destanekê biafirîne û bixemilîne. Êdî hew tu destan dihedîn dilê giriyan. Bila nexş û rengên xwe ji Kawayê Hesinker, Ker û Kulik û Mîrza Miheme bistînin. Bila li ser lehengiya Mezlûm û Egîd bin.

Ey hozan û wênevanê hemdem, ey

têkoşerê ku li hemberî hemû hovîtiyê şer dîke! Mîtolojiyêkê birengîne. Bi wan destên adan û pîroz mîtolojiyêkê wergerîne rastiye. Bila mîtolojiya netewekî ji êgir û ronahiye be. Bila haveynê vî neteweyî ji agirê Zerdeşt be û ji Ehrîman dîr be.

Ey Zerdeştê kal incex tu dikarî bibî stêra fereca xêrê. Bi tenê tu dikarî van sefilên ku li serê cîhanê bûne bela pak bikî. Ku tu vê qirêja cîhanê di dojeha xwe de nesojî, bi tu awayî xerabî wernagere rindiyê.

Va ye dîsa Çiyayên me û Zerdeştê kal bûne hêviya mirovahiye. Beriya ku pêxemberî ji Zerdeşt re were û ew bibe hêvî ji mirovahiya wê demê re, ew nêzî sih salî li cihê bilind ê çiyayê welatê me mabû. Li serê çiyân fikr û ramana xwe kemilandibû û bi pêş ve biribû. Paşê hatibû felsefeya xwe ya ku ne tenê ji qewmê xwe re, ji hemû mirovyê re hêvî, bextiyarî û ronahî anîbû, pêşkêş kiribû. Zerdeştê kal bi agirê xwe dilê zalim û xeraban ê tarî û cemidî, ronî û germ kiribû. Zerdeşt ne bi tenê dilovan, xizan û mezlûm xelas kiribûn. Li dilreş û zaliman jî hatibû rehmê û ew ji wî ezabê giran rizgar kiribûn...

Çavên te ronî Tirkîye, li Amedê kes tune

Vegirtoxê Kibrisê, lawikêreş (Qereoglan), tika ye vê peyva "lawik" bi awayekî din şîrove nekin. Lewre divê mirov "çewt rûne, rast bipeyive" gelek tişt der barê Eco (dîsa tika ye, hûn navê Eco wekî pereyên Yekîtiya Ewrûpayê nexwînin. Van rojan gira Eco li hemberî Eco (Eko) pir e, ji ber ku Ewrûpa hemû kurdan wekî Hîtler navêje firinan) de hatin gotin lê kesî navekî bi vî rengî bi pey wî nexistiye.

Hindek dikarin bibêjin çî nav bi pey wî hatine xistin. Li vê derê em çend heban rêz bikin "Poznikulê xwînmij (Özgür Politika), Türkesê çepgir (raya giştî ya demokratîk), serjinik (Gökhan Çapoğlu), faşist Eco (Hozan Emekçi)

Niha vegeerî ser mijara xwe. Eco çenteyekî James Bond girte destê xwe û ke-te riya Amedê, lê li kolanên Amedê ji bilî gurg û guhdîrejan kes nedît. Li ser vê helwesta sosret a gelê Amedê, Ajansa Nûçeyên Nîgaşî (ANN) nûçeyêke şîroyeyî bo kiryarên xwe ragihand. Em bêşîrove nûçeyê diweşînin.

ANN (11.14. 1999'ê nîgaşî)

Mehmet Kuyruklu Türk/ Diyarbekir

Serokê DDT, biborin DSP, Çentikek tijî pereyên Amerîkayê û jê re US dolar (Yu es dolir tê xwendin) tê gotin û sem-


bola wê şîveriyêke li ser ş'yekê (\$) hate Amedê lê kurdên nankor, biborin Tirkên koyî ev bi tenê hişt. Li dora 200 kes çû pêşiya Eco û ev girseya mezin di koxika hilbijartinê ya DSP hilnehat. Li ser vê mijarê di navbera Rehşîn û Eco de ev guftûgo derbas bû:

- Eco gazî millet bike, bila giş bîn hundir, Xwedê neke ew Apocî tiştêkî bikin, em ji bin barê tazmînata wan der-nayên. Jiwxê me ew giş ji mezata bêkaran a Enqereyê berhevkin. Yewmiya wan têra xwe mesref derdixê, bila riya tazmînata jî li wan vebe.

- Wisa nebêje Rehşîn, binêr ev ên han ji Kexteyê hatine.

- Kijan, ewên poçdirêj?

- Erê!



çima wisa dirêj bûne? Kesî qala vê yekê nekiribû.

- Hiş be! Rehşîn tu yê wan jî birevîni ha! Gel ev qas ji wan re gotiye ceş, lewma guhên wan dirêj bûne û poçik li wan çêbûye.

- Nexwe gotina dayika min rast bûye.

- Dayika te çî digot Rehşîn?

- Wê digot: "Tu ji yekî/ê re 40 çarî bibêjî dîn, dê dîn bibe"

(Çend galegalên ku nehatin fêmkirin)

- Eco li van deran mizgeftêk nîn e ku em herin nimêj bikin.

- Gelekî baş e, serê poça wan dişibe serê kevoka me ha! Dema ez biçûk bûn hinekan digot "kuyruklu Kürt" min bawer nedikir. Wisa xuya ye wan rast gotiye. Lê guhên wan

- Ew ji ku derket Rehşîn, li gorî zanîna min tu Xwedênenas î, kengî tu bûy misilman?

- Wele Eco gotinên ku me digot "Xurafe" giş rast derdikevin. Nexwe cenet û cihnem jî heye?

- Ji bilî çend hebên ku gelê vir dibêje "şeytanok" meleyên vir jî giş Apocî ne, lewma jî em dê nimêja xwe li Anitqebirê bikin.

Piştî vê gotûbêjê, Eco berê xwe da polîsan got: Gel gel berî gel! Ji guhdîrejan tirî ku ew dibêje gel çûye bêriyê lewma, kes nehatiye. Yekî got:

- Qomutanîm, gel hepîsi terorist olmîş, bêriye gitmemîş, Apo'nîn adamlerî dişarî çiqme yasaxî îlan yapmîş, onin çûn gelmemîşler. Li ser vê yekê ew kes hate derdestkirin. Polîsan hemû kasetên kamerayên televîzyonê berhevkin û defterên me çirandin. Lê min ew li mêmîyê xwe nivîsand.

Li Amedê strana ku DSP'ê ji Hozan Emekçi dizîbû, careke din hatibû guhar-tin û bi vî rengî dihat lêdan:

Çavên te ronî Tirkîye

Li Amedê kes tune

Me çente tijî dolar kir

Lê kesî guh lê nekir.

QEDEXE GERNAS

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (163) XAÇEPIRSA

Phonetic	S	A	O	R	B						
International	S	E	R	P	I	L	P	O	L	A	T
Latin	R	O	N	A	L	B	E	N	D		
Arabic	S	O	N	D	N	A	N	A	P		
Hebrew	K	A	R	T	A	R	T	N			
Yiddish	Z	H	A	V	I	N	N	A	N		
Armenian	D	I	N	A	N	A					
Georgian	K	A	S	N	A	L					
Abkhazian	B	R	A	A	X	A					
Ossetian	H	A	Z	A	R	N					

PEYVA VEŞARÎ →

Bersiva Xaçepirsa 161'ê

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hej-mara me ya 163'yan, pirtûka Hasan Kaya "Gimewas" e.

GIRNEWAS

Hasan Kaya




Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxan-din, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepir-sê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên xelata hejmarê 161'ê, pirtûka 'Ziwanê ma alfaba ma' qezenc kirine: Elif Yaman/ Edene, Ahmet Öcal/ Semsûr, Brader Baz/ Stenbol, Qehreman Uçar/ Sêrt, Ali Nas/ Meletî.

Sadiqî Hunermen dê kurd (wêne)	Xwişka bav Bi kirdkî alî	Cinavkek Tûlim	Gelekî kurdîstani Rêxistinek	Firendeye ke leşxur Bi sorani ev der	Bi devoka Elbistanê "av"
	1		7	5	
Bi kirdkî parçe sewiye			Ava bi sir û xwê		
6		Kêfxweş Rihetî	3	Dengê hîlbijêr Cureyek nimêj	2
Sembola oksîjenê	Paşgirek			Kesê avê dixwaze	Baneşane k
Eş û...	Gelê aryani				
		Kûçik Saziya fezay ya DYA'yê		Parçeyekî erebeyê Exlaq	8
Welatekî ciran Tîpeke dengêr	9		Paşdaçeke k ... û zinar		
10	Hilberandi n Darek				
Tîpa piştî Ş'yê Cih û war	Xaçparêz. file				
		Çalak	4		



PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

Dewleta muxalîfan kiştin dewam kena

Polîsanê Stenbolî 5'ê meng de bananê rojnameyê Atılım, Dayanışma û navendê kulturî Beksav rê virdayin viraşt. Banê nê saziyan serûbin kerdî, xebatkar û meymanê ci girotî binçim. Sendikavan Süleyman Yeter jî miyan de bi. Süleyman Yeter verî girotya binçim û xeylê îşkence dî û bado viradiya. Feqet îşkencekerdoxan ra fin Süleyman Yeter weş nêvet tever. O jî zey xeylê kesanê verînan îşkencekerdina kişt û peyra vejîyay qe nêsermayina vat ke, Yeterî rê îşkence nêvirazîyayo, vindartinê zerya (dil) ci ser merdo. Serdarê Polîsanê wina vanê feqet raporê otopsiyê vatenanê nînan zûri vejenê. Goreyê raporê otopsi Yeterî binçim de îşkence diyo. Ancî goreyê abûkatanê Süleyman Yeterî polîsan binçim de jew nengûyê ci jî anto. Mehitê Yeterî 10'ê meng de tewrbîyinê 2500 kesana Alibeyköy de diya har.

MEM KAYA

BÊJING



Dewleta zûranê xo, bi xo eşkera kena

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî Tirkîye de jû menga xo kerd pîr. Dewleta tirk wexto ke Öcalan tarzê derqanûnî û namerdî ard bi Tirkîye, hend paya kerdê ke qelemana nênusuyayê. Dewleta Tirk no karî zey serkewtinê xo da şînasnayin. Feqet maben ra hewna jû meng nêravêrdê vatenî dewlet bi xo kerdî zûrî.

Dewleta tirk wastena Mahkameya Haqê Mardimanê Ewropa ser, derheqê rewşê Öcalanî de Mahkama rê jû mektûp rişt. Na mektûp de ca diyayo Tirkîye ardin û rewşê ewroyinê Serokê PKK Abdullah Öcalanî. Mektûp de vajyayo ke Öcalan serdaranê dewleta Kenya tepîşt, kerd bêtesîr û ard balafirgeh de teslimê ma kerd.

Dewlet mektûp de dewam ra wina vato: "Polîsan Öcalan çim raceneye teslimê ma kerd. Wexto ke Öcalan teslimê ma kerd, hema doxtorê ma çimê Öcalanî akerdî û o tedawî kerd." Ze ke yeno zanayin dewlet Öcalan Tirkîye ardin peyra di kasetê vîdeo û çend heb jî wênay daybî medya. Kasetan ra jew ê raywanîna tiyarabi o bîn jî raywanîna keştî (gemî) bi.

Destpêka nê kasetan de çimê Öcalanî çapûta girêdaybî (racenaybî). Kasetê verî de oyo ayseno senî iyê çemanê o-

Tabî dewlet qe tiyay nêfikiryaya ke, a mektûp de nûşto ke, çimê Öcalanî polîsanê Kenya racenayê. Ma tiya ra vajim. Qebûl sebebê çimanê Öcalanî teyara de racenayin polîsê Kenya yê. Ma sebebê gemî û al bin de çimanê Öcalanî racenayin kam ê? Ma polîsanê Kenya Öcalan hetanî İmralı ard, şimayê, heme çî çekenê polîsanê Kenya ser.

calanî akenê. Feqet kasetê didiyan de nêayseno çî wext çimê ci akerdê. Kaset û wênayê ke dewlet dayê medyaya xerîp ra ma yê fahm kemi ke dewlet Öcalan berdo ala xo bin û ala xo bin de, verî çim racenaye wênayê ci antê û bado jî çimê Öcalanî akerdê û çim akerde wênayê ci antê. Çim racenayey dayê medyaya xerîb, çim akerdey jî dayê medyaya xo. Çi ke wênayê ke medyaya tirk de vejîyay, çimê Öcalanî akerdeybi û ewnayê çorşmeyê xo ke hele bizano oyo kotî. Nê biyayan ser xeylê dewletan û çorşmanê demokratîkan dewleta tirk rexne kerd. Coka dewlet çimracenayin hema çeker polîsanê Kenya ser.

Tabî dewlet qe tiyay nêfikiryaya ke, a mektûp de nûşto ke, çimê Öcalanî po-

lisane Kenya racenayê. Ma tiya ra vajim. Qebûl sebebê çimanê Öcalanî teyara de racenayin polîsê Kenya yê. Ma sebebê gemî û al bin de çimanê Öcalanî racenayin kam ê? Ma polîsanê Kenya Öcalan hetanî İmralı ard, şimayê, heme çî çekenê polîsanê Kenya ser. Ancî mektûp de vajyayo ke, qandê Öcalanî awa germ û sard her deqa hedre ya, wazirê îmkanê wendina kovar û kitabano, qandê goşdarîn radyo diyaya ci oyo jew odayêdo 13'ê metrey de maneno.

Dewlet mektûpda xo de îdia kerdo ke, Öcalan qandê weşîna xoya rojanî dewamkerdin her îmkan diyayo ci û wina dewam kerdo: "Ma qandê ihtimalê nêweşin jî dariyo her çeşîtiya piya 4 doxtor û jûna jî hemşîra, îmralî de hazir

tepiştê." Nînan piya jî dewlet mektûp de vato ke, qandê xo tecrît de nêhesipnayin tedbir girotyayo û mayê ey her roj vejem eywana (45 metreka) serakerdey ke hewa bigiro. Vardayin û zordayinê psikolojîk û fizîkiyê nêviraziyenê.

Dewlet mektûpda xo de ca dayo nînan. La belê vatenanê abûqat ra oyo ayseno ke nê pêro zûrê. Dewlet nê qandê xapeynayin ardê zîwan. Eke çiyê ke dewlet ardê zîwan zûri niyê, çira iyê nêviradenê abûkatê Öcalanî şiro pa pêdiyan virazo. Abûkat A. Zeki Okçuoğlu, qandê destûrgirota pêdiyina Öcalanî 9'ê meng de Stenbol ra şî Enqere DGM'ya wijay û Wezeratê Edeletî ra destûr girot û 10'ê meng de şî Mudanya ke Öcalanî ya pêdiyan virazo. Feqet Okçuoğlu senî kerd nêşa şiro Öcalanî ya pêdiyan virazo. Ancî lazim o ke qandê wekaletgîrotin abûkat jî notera şiro, dewlet nêvirada ke Okçuoğlu notera şiro jew noter şî û qandê Okçuoğlu wekalet girot. Ancî jî nêşa Öcalanî ya pêdiyan virazo. Oyo winî ayseno ke dewleta wazena zûrana Mahkamaya Haqê Mardimanê Ewropa ya piya dinyay bixapeyno.

MEMED DREWŞ

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
Yönetim Yeri:
Kad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308
Eveoğlu/İstanbul

TEL: (0 212)
245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13
FAX: 251 95 85
■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN
■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.
■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NIVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ
(İrtibat büroları)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83
■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

■ Edene
Tel: 0 (322) 351 42 78
■ (Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Fransa:

M. Ali Doğan
Tel- 33 614 32 43 55
■ Belçika
I. Can
Tel: 32 53 64 12 41
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsi

Partiya Karkerên Kurdistanê 6. emîn Kongreya xwe li Kurdistanê pêk anî

Kongreya Serkeftinê

Kongreya 6'an a PKK'ê li Kurdistanê li herêmeke di bin destê gerîla de bi beşdariya ji 300'î zêdetir delegeyî pêk hat. Di encama kongreyê de biryarên girîng hatin girtin û Abdullah Öcalan bi erêkirina hemû delegeyan ji nû ve wekî Serokê Giştî yê PKK'ê hate hilbijartin.

Kongreya 6'an a PKK'ê li Kurdistanê li herêmeke di bin destê gerîla de bi beşdariya ji 300'î zêdetir delegeyî pêk hat. Komîteya Navendî ya PKK'ê da zanin ku Kongreya 6'an a Serkeftinê li dijî komploya navneteweyî ya ku li dijî serokatî, partî û gelê wan hatiye lidarxistin bersivê serkeftî ye. Di kongreyê de hate diyarkirin ku serokatiya PKK'ê digel ku xwestiye bi şeweyekî aştiyane û siyasî kêşeya kurdî çareser bike jî, beramberî komployeke bêbext a navneteweyî maye.

Di encama kongreyê de Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan di serok hate hilbijartin. Komîteya Navendî bang li dewleta tirk kir û got: "Ger hûn Serok Apo bişibînin serokên berê yên kurd, hûn jî di nava çewtiyê mezî de ne. Ger kiryarên we yên bi heman şeweyî bidomin, hûn dê beramberî kiryarên heman şeweyî bimînin. Ger hûn li vê cihanê mafê jiyane nedin me, hûnê jî ji heman mafî bepar bimînin." Her wiha Komîteya Navendî derbarê Amerîka û Îsraîlê de jî wiha got: "Van her du hêzan ji destpêkê vir de di komploya ku li dijî serokatiya me hatiye lidarxistin de bi awayekî kirêt cih girtiye. Di encamê de wan hêrs û gira gelê me qezenc kiriye, dê bersiva xwe bi pêngava me ya şoreşgerî bibînin."

Biryarên ku Komîteya Navendî ya Partiya Karkerên Kurdistanê di Kongreya 6'an de girtine, wiha hatine rêzkirin:


Rojhilata Navîn

Gelên Rojhilata Navîn di çarçoveya "Pergala Cihanê ya Nû" de bi êrişên împeryalist û sîyonîstan re rû bi rû ne. Ev komplo di kesayetiya Serok Apo de li dijî gelên herêmê hatiye lidarxistin. Lewre jî divê hemû hêzên demokrat, pêşverû û gelên misilman ên herêmê jî bo têkoşina hevbeş bêne cem hev.

Hemû milîtanên partiyê û şervanên ARGK'ê

Em di encama nixandî û biryarên berfireh ên Kongreya 6'an de ketine pêvajoya bidestxistina serkeftinê. Serok Apo di rapora ku şandîye kongreyê de peywirên ku divê em bi cih binin spartine me. Serok Apo ji destpêkê hetanî niha bi xebat û hewldanên xwe yên berfireh xeta me ya şoreşgerî zelal kiriye. Li ser vê bingehe divê emê bi ruhê fedakar ê Apocîtiyê ve xetê bişopînin û biparêzin.

Divê hemû şervan û fermandarên ARGK li dijî dek û dolabên dijmin hişyar



bin, bibin dūajoyên serkeftî yên xeta serokatiyê. Her wiha divê yekîtiya partiyê di ser her tiştî re bigirin, serdanpê bibin fedayî, bi awayekî jêhatî serkêşiya têkoşina rizgariya neteweyî bikin û ji bo bidestxistina serkeftinê bi ruhê Apocîtiyê tevbigerin.

Başûrê Kurdistanê

Kongreya me ya 6'an rewşa xweser a tevahiya parçeyên Kurdistanê nixandiye, bi taybetî li ser Başûr rawestiyaye. Ji ber bêaramî û guherbariya vî parçeyê welêt, li wir pêdiviya têkoşinê û birêxistinê dîtiye. Lewre jî bo meşandina van kar û baran xwe bi navê PKK-Başûr birêxistin kiriye. Kongreya me, şerê ku ev du sal in li vî parçeyê welêt hatiye meşandin nixandiye, pêdiviya hin sererastkirin û guherînan dîtiye. Her wiha digel li dijî xiyane û hevkarîyê meşandina têkoşinê, ji bo ku hêzên neteweyî yên Başûr di bin banê Kongreya Neteweyî de bîne cem hev di hewldanê de ye.

YAJK

Babeteke ku Kongreya 6'an li ser hûr bûye jî tevgera jinan e. Wekî tê zanîn Serokatiya Partiyê li ser vê tevgerê gelekî bihûrbînî rawestiyaye û ev tevger di têkoşinê de bi erêke girîng radişe. Di kongreyê de jî bo bêtir bipêşketina vê tevgerê nixandî berfireh hatine kirin û biryarên girîng hatine girtin. Her wiha hatiye diyarkirin ku birêxistinê û karîgerkirina hêza navborî jî bo qezenckirina pêvajoya pêşiya me gelekî girîng e.

Artêşa Rizgariya Gelên Anatoliyê (AHKO) hate sazîkin.

Kongreya 6'an li ser pêşvebirina tevgera şoreşgerî û demokratîk a Tirkîyeyê rawestiyaye. Li ser vê mijarê di daxuyaniya encamê ya Kongreyê de ev hatine gotin: "Têkoşina Rizgariya Neteweyî ji bo ku mêtîngeriye di cih û warê wê de bixwe tengasiyê, pêdiviya bipêşxistin û berfirekirina têkoşina demokratîk û şoreşgerî ya Tirkîyeyê dîtiye. Kongreya me rewşa Tirkîyeyê ya berbiçav raçav kiriye, li aliyekî piştewaniya têkoşina hêzên li dijî mêtîngeriye û faşîzmê dike, li aliyê din jî dixwaze di serî de li herêma Derya Reş û Deryaya Spî çalakiyên hetanî nava Tirkîyeyê belav bike û bi vê yekê ve girêdayî hewcedariya danîna Artêşa Rizgariya Gelên Anatoliyê dibîne. Bi taybetî jî piştî ku Komara Tirk bi komploya dawîn re dest bi tevkujiyan kir, xebateke wiha girîngtir bûye. Divê gelên Tirkîyeyê jî bîr nekin ku li ser rûyê cihanê mirovê dost û nêzîktirîn ê rastiya gelê tirk Serok Apo ye."

Jinûvesazîkin

Li gorî encamnameyê di Kongreyê de li ser gelekî gelş û aloziyên navxweyî jî hatiye rawestandî û ji bo xwenûkirina rêxistinê hin biryar girtine.

"Kongreya me ya 6'an xeta hevkarî û çeteyî ya şopajoya mêtîngeriye û çîna fedodal-komprador a di nava partiyê de nixandiye û mehkûm kiriye. Li hemû nêzîktêdayînên şexsî, neguherîner, teng û reaksiyoner ku li hemberî birêxistinbûn,

partiyê û pêşketinê asteng in rexne hatine girtin, rîya rast a li ser xeta serokatiyê birêxistinê û birêvebirinê hatiye destnîşankirin. Dîsa pêşketinê vê dawiyê hatine nixandî û li ser bingeha wê hin guherînan pêk hatine û ev biryarên guherînan jî jinûvesazîkirinê di rêznameyê de hatine bicîhkirin."

Komploye gelê me kiriye hêzeke fedayî

PKK-KN'yê diyar kir ku bi komploye re PKK û gelê kurd bûye hêzeke fedayî û ev nixandî hatiye kirin: "Ji hêza dijmin a navneteweyî werê tê ku wan bi sergîhiyîkirina komploye serkeftineke mezî bi dest xistiye lê berevajî vê yekê, komploya hovane gel û partiya me kiriye hêzeke fedayî. Kongreya me ya 6'an hêzên êrişkar ên çavsoz ku dixwazin di kesayetiya Serokatiyê de pêşeroja gelê kurd tarî bikin, germegerm şopandiye û nixandiye û biryar girtiye ku li dijî vê nijdeya navneteweyî ya ku hemû rêz û rêçikên navneteweyî binpê kirine bersivê girseyî, leşkerî, siyasî û rêxistinî bide." PKK-KN bang li kurdên bakurê Kurdistanê, Tirkîyeyê dike û wiha dibêje: "Divê hûn ji bo ku sistema KT'ê ji holê rakin û di asta serhildanan de bi hemû metodên têbîkoşin. Her wiha bo kurdên tevaya cihanê jî dibêje: "Divê hûn ji bo piştewaniya Serok Apo û têkoşina bakurê Kurdistanê bêwestan û rawestan çalakiyên xwe bidomînin."

NAVENDA NÛÇEYAN